


E

v heftê sal in
 ku siyaseteke çewt
 hatiye çekirin û rêve-
 berên dewletê her ku
 çûye, bêhtir bi şîdet ev
 çewtî domandine.
 Xerabiyên mezin
 qewimîn. Ez li ser navê
 tîrkan şermezár im.
 Dema kurdekkî dibînim,
 çawa ku di wê xerabiya
 ku hatiye serê wan de
 para min jî hebe, ez
 diêşim. Wan jî di dawiyê
 de reaksiyonâ xwe ya
 însanî dane nîşan.
 Ji bo ku ev qanûn rabin
 ez van kitêban çap
 dikim. Ku kes li hemberî
 van qanûnên çewt
 tiştekî neke, wê ev her
 bimînin. Divê mirov li
 hemberî wan tekoşînê
 bide. Li vî welatî azadiya
 raman gelek kesan
 eleqeder nake. Yanê ne
 wekî hemwelatiyê
 neteweyekê ne, mîna
 endamên cemaetekê ne.
 Vê ji xwe re nakin pirs-
 girêk. Lê rastî ev e ku
 azadiya raman temel û
 xîmê hemû mafan e...

Rûpel 8-9



Vîskar 10 wosanym

dal Öz:

MIROV ZİMARDE DÖCKE DİKEZ!

- “Nîrên çapkırına weşanên kurdî li Sûriyeyê zor dijwar in”, HELÎM YÜSIV bi berpirsên kovarên kurdî re hevpeyvîn pêk anîn û rewşa wan û xwendevanên bi kurdî bi me dide zanîn.
 Hevpeyvîna pêşîn bi Kovara Pîrsê re. Rûpel 4
- Büyera Susurlukê hê jî di rojevê de ye. SIBERBANG bi sernava “Dewlek ketiy buhrana ehlaqî” dîtin û nirxandinên li ser vê büyerê bi şêweyê nûçe-şîroveyî radigihîne. Rûpel 3
- LERZAN JANDÎL, bi mesta salvegera bidardekirina Serokê Serhildana Dêrsimê nivîsek bi navê “Sey Riza” nivîsi û li ser xisletên wî radiweste. Rûpel 11



İ. Omer: Hezkirina Apê Mûsa
ya ji sewalan



R. Dilovan: Ew bi dilên xwe
ji me çetir dibînin



Dildar Şeko: Bîranîna
Melayê Cizîrî û pêşniyazek

Ji Xwendevan

EZ naxwazim qala kemasîyan bikim, ez dixwazim qala yekîtiyê bikim.
Azadiya Welat nîşana welitekî serbixe ye. Em karkerê Kurdistanê yên ku li Tirkîyeyê dijîn, emê heta dawiyê bi Azadiya Welat re bin.

Li Tirkîyeyê rojnameya ku bi zimanê kurdi derdikeve, wekî tê zanîn yek bi tevêye. Ji hemû gelê kurd re pêwist e ku di nava rûpelê vê rojnameyê de çand û hunera xwe ya gelêri bibîne. Ji vê bi rûmetir tiştik nîn e. Em banga xwe li hemû xort û keçen kurd dîkin ku li Azadiya Welat xwedî derkevin. Ji Azadiya Welat re pêşveçûn û serkeftinê dixwazim û ji hemû xebatkarê rojnameyê re silav û hurmeten xwe diyar dikim.

YAŞAR TOPÇU/İZMİR

Ji ber ku rojnameya Azadiya Welat bi kurmancî derdikeve, ji aliye dagirkevan ve wekî neyar tê dîtin, ci ji destê wan tê dîkin ji bo ku rojname neyê firotin. Hinek bayî hene ji tîrsan nikarin rojnameyê bifiroşin, heta te nas nekin, rojnameyê nadine te. Di nav van astengiyan de em xwe digihînîn rojnameyê. Rojnameya Azadiya Welat bûye wekî nan û av ji me re, edî bêyi rojnameyê em nikarin bisekinin. Ji ber ku zimanê kurmancî bi me şîrîn kir zor spas.

BAHATTİN /STENBOL

6

10



Tu çiqas tevdidî ew qas bêhn dide

MEHMET GEMSİZ

Beriya qezaya li Susurlukê, kesen şe-refyar û xîretdar bi bêhna pîsa ku ji "çeteyen bi uniforma" dihat, dihesiyan. Di nivîs û axaftinê xwe de ew rewdestnîsan dikirin. Lî, tavîlê giregir û mezinê dewletê bi ser wan de dicûn û li wan didan gef û guran û ew bi piştevaniya "veqetînwazan" tawanbar dikirin.

Gercî serî ketibû ser çeteyan, lê piştemriyên wan "çete"yan ew diparastin. Çendek bi şûn de his û pisek ji bûyerê nedihat û bindoşek dibû diçû.

Çapemenî ji bi tirsonekî carinan ji "hebûna" çeteyen dewletê behs dikir, hew. Ji ber ku ew ji ne serbixe bû. Têkiliya di navbera patronê medya û hikûmetan de, jixwe ne hewceyî gotinê ye.

Em balê bikişînin ser niqteyeke girîng ku, yêni di medyayê de ji mafya û çeteyen dewletê behs dikirin, bi piranî wekî kesen dijber (muxalîf) ji aliye raya giştî ya Tirkîyeyê dihatin naskirin.

Lewma "zariyên fedekar ên Tirkîyeyê" bi hîsanî gotinê wan "pûc û derewîn" derdixistin û wekî xayîn û piştigirên PKK'ê û lan dikirin, ku dîkin ji...

Gelê kurd, mirovân demokrat, welatparêz û pêşverû baş dizanin ku şerî qirêji li Kurdistanê çawa tê meşandin, kî ji he-

bûna şer rant bi dest dixe; teşkilata polisan, tîmîn taybet, leşker, cehş û serokên wan ci dikin.

Lî hemû gotin û daxuyaniyê wan, li gotinê rayedarê dewletê diqelibin û pêşixa wan tê girtin. Ew "bedniyaz" in, ji bo wan.

Em bibêjin şabaş ji şofêrê kamyonê re ku bû sedem "perde" bê hilanîn. Li İtalyâyê bi saya qezaya balafireke (teyareyeke) leşkerî hebûna "gladio" eşkere bû, yanê rîxistina kontr-gerîla derkete rastê.

Îcar li Tirkîyeyê ji bi eynî awayî kontr-gerîla tip tazî xuya bû. Çendî ku medya bi bûyerê girtiye û bernade ji, hikûmet û dewlet wekî ku tiştik nebûbe, deng ji xwe dernaxe.

Dozgerê DGM'ê "Em ne bi serê xwe ne" dibêje. Yanê, wisa xuya ye ku wê ser vê bûyerê ji bê girtin. Tenê şofêr wê ceza bixwe û ew qas...

Daxuyaniya şırıkîn hikûmetê, der barê istifaya Mehmet Ağar de eynî ye: Ji ber nexweşîna qîza xwe camêr istifâ kiriye. Erbakan ji wisa dibêje, ku bi slogan "adil düzen" (pergala dadmend) ray ji gel standibûn û hatibû ser kar, digel Tansu Çiller. De werin temaşeyê ji xwe re.

Ağar ê ku navê wî bi çeteyan re tê bi-

lêvkirin, bi ser de heqaret dike û dibêje" kesê ku bibêje têkiliya dewletê bi karênelîr û qanûnî re heye "alçax e."

Dibêjin "Ê serê sekiniyê, yê binî nasekine." Ev jî ew e. Çima nebêje, pişa wi xurt e. Ji ber ku ew ne bi tenê ye û hevalîn wî jî hene û li ser kar in jî. Hikûmet li riyan digere ku ser bûyerê bigire, helwest ev e.

Ji aliye din ve qezayê kir ku êdî pergalarê, komarparêz, kemalist, dewletparêz û nizanim ci jî bipeyivin. Çimkî roj bi bêjingê nehate girtin, an jî pîsiya ku bi berfê hatibû nixamtin eşkere bû.

Piştî van gotinan em dorê bidine daxuyaniyê Serokê Cişî yê Partiya Dayikanîstiman (ANAP) Mesut Yılmaz:

"Dewletê heş sal berê di nav emniyetê de saziyeke alternatif li dijî MîT'ê ava kir. Lî ev, salek e ku xizmeta siyasiyan dike. Ji bo ku hikûmet serê nenixumîne, ez belgeyan di destê xwe de dihîvişînin (muhafize dikim).

Dewletê pêlî çemûrê kiriye. Ewletiya canê mirovan nema. Bi dewletê ewle nebin ku wê ewletiya canê we temîn bike. Ew rîxistîneke pir mezin e. Lî ez bi biryam im. Natirsim."

Daxuyaniyê Yılmaz, roja 13'ê sermawêzî di rojnameya Hürriyetê de, hem jî li ser heş stûnan û bi sernava "Em tev di talâkeye de ne" derket. Ew bi xwe êdî ji hebûna "rîxistina veşarî" behs dike...

Kurm û beytik ketine "serê dewletê", tîmarkirin ne mimkûn e. Şerê kirêt wê jî dixwe.

Kî ci dike bi xwe re dike?!"

Pêwistbûna hezkirina ji serokatiyê

HARBİ SOYLU

Di nav hemû civak, gel, netewe û çînan de cihê hezkirin, evîn û eşqê heye. Lewre hezkirin girêdan e. Ger ku netewe bixwazin yekîtiya xwe çebikin, berî her tiştî lazim e ku endamîn wê neteweyê ji hev hez bikin. Dema mirov li rewşa gelê Kurdistanê bînêre, wê hezkirina rast û şaş, evîna civakî û ya şexsî derkeve holê.

Di civaka Kurdistanê de evîn û hezkirin pir xurt e. Her wekî gelek ji wan hezkirinan bûne destan û heta rojâ iro hatine. Wekî evîna Mem û Zînê, Xecê û Siyabend û hwd. Her çiqas mînakên evînê zêde bin ji, bi piranî eşq; evîn û hezkirina li Kurdistanê li ser berjewendiyê erzan bi pêş ketiye. Vê rewşê heta derketina tevgera azadiyê dom kiriye. Li Kurdistanê têkiliyê hezkirinê ketibûn, ji ber ku civak ketibû. Gel ji hezar salan ve di bin bandora biyanan de dijiya. Îcar ku welat Kurdistan be û biyan ji nîjadperesten tîr bin, rewş bêhtir xerab dibe. Anglo bîrdoza kemaîzîmê mirovan dixe rengê sewalan

Kemaîzîm înkarkirina gelan e. Ji xeynî xwe mafê jiyanê nade tu kesen din. Mirovekî li ser bîrdoz, konevanî û netewe heta çandeke li dijî kemaîzîmê bifikire dawiya wî tê, qet nebe wî davêjin zîndanê. Têkiliyê ku di sîstema kemaîzîmê de çebibin herdem bandora kemaîzîmê di nav xwe de diparêzin û ji

Ji bo ku mirov xwe bigihîne hezkirineke rast û evîneke azad divê mirov şer bike. Şer mirovan xweşik dike. Mirovê xweşik ji bêhtir tê hezkirin. Ji xwe şoreş jî têkiliyên azad ava dike. Heta gel ji bin destan xelas nebe, hemû têkiliyên ne şoreşgerî, têkiliyên mirinê ne.

sedî sed celawajî ne. Ew kesen ku bibêjin em welatparêz in, pêwist e ku girêdana xwe ji kemaîzîmê û ji hemû têkiliyên pergala wê bîrdozê qut bikin. Gava pêşî ev e. Gava duwem divê mirov têkiliyên xwe bi şoreşê re çêbike, şexsîyeteke şoreşgerî çêbike.

Di nav şoreşê de hemû têkili li ser xeta serokatiyê bi pêş dikevin û dimeşin. Ji bilî jiyanâ partiyê hemû jiyanen mayîn di nav refen şoreşê de cih nabîn. Dudîlî, waswase mirov pirtir ber bi jiyanâ berê dibin. Serokatî di nîvîn xwe de wiha dibêje: "Ger hûn dixwazin ruhê partiyê, ruhê serokatiyê bigirin, divê hûn pûtên di hundirê xwe de bisikînîn." Ger mirov şexsiyeta berê neşkîne, mirov nikare ya nû ji bigire. Wê gavê mirov nikare bigihîje evîna mezîn a welat. Mirov nikare bibêje ez ji serokatiyê hez dikim, lewre hezkirin girêdan e. Girêdan ji di jiyanê de pêkanîna xeta serokatiyê ye. An hezkirina welat û serokatiyê an ji hezkirina jiyanek erzan.

Di vî warî de mînakeke dîrokî wiha ye: Rojekê hawariyekî Hz. Isa ji wî re dibêje: "Ez ji pirekekê hez dikim, ez ji

te jîhez dikim ey Isa!" Hz. Isa ji wiha bersiva wî dide: "Na tu derewan dikî, ku tu ji pirekekê hez bikî, tu ji min hez nakî. Du evîn bi hev re nabin." Ger em ji li ser evîna dilan serê xwe bişînîn, wê demê emê têkoşînî ji bîr bikin. Riya navîn tune ye, ne şoreş wê yekê dipejirîne, ne ji neyar. Ji bo ku mirov xwe bigihîne hezkirineke rast û evîneke azad divê mirov şer bike. Şer mirovan xweşik dike. Mirovê xweşik ji bêhtir tê hezkirin. Ji xwe şoreş jî têkiliyên azad ava dike. Heta gel ji bin destan xelas nebe, hemû têkiliyên ne şoreşgerî, têkiliyên mirinê ne. Lewre riya hezkirineke rast di nav têkiliyên azad re dibore. Di encamê de mirov dikare wiha bîbêje; pêwist e mirov bi evîna welat bîjî. Ew kesen ku peywira xwe li hemberî gel, şoreş, serokatî û mirovatiyê pêk bîne, mafê evînê yê wî ye. Ew mirov xwedîyê evînê ye. Ji bo ku mafê evînê bixin destê xwe, em tev bi hev re di riya serokatiyê de bimeşin, em gotinê wî bi kemasî bînîn cih û em wî di jiyanê de temsîl bikin. Ji ber ku hezkirina serokatiyê, hezkirina jiyanâ azad bi xwe ye.



Li gorî rezeniviseke ku di rojnameya Radikalê de bi sermava "Tasra Üniversiteler" derket, di nava du mehan de ji Zankoya Amedê 150 xwendevan, di dema îmtîhan de hatine birîçavkirin. Ev nîvîsa ku roja 14'ê sermawezê di rojnameya navborî de derket, dide zanîn ku li hemû zankoyen li bajarê Kurdistanê çalakiyên çand û hunerî qedexe ne.

Ji nîvîse eşkere dibe ku endamên MHP'ê bi teşwîka hêzên dewletê û rayedarên zankoyan, pêkutlyê li xwendevanan dikin. Bo nîmûne, li Zankoya Wanê bi navê Faziletê Ulukuciyê ders heye, li odeya hinek mamesteyan alen sê heyy daleqandî ne û li Zankoya Fıratê di dersan de tê gotin ku pêşyîn kurd û ermenan tune ne.



MEBÜSE Refahê yê Erzeromê Abdullilah Fırat, cerdevan weki 'ku-jerên bimeaş' bi nav kirin. Li gorî nûcyeke ku roja 14'ê sermawezê di rojnameya Yeni Yüzyılê de derket, mebûse RP'ê Fırat, cerdevan şibandin lejyonerên fransiz û got: "Biçek-kirina kesen ku ji şeref û rûmetê para xwe nestandine, cînayet e."

Fırat xwest ku hêzên dewletê bi xwe karê ewletiyê bikin û çekan nedin kesen ji herêmê. Mebûse Erzeromê Abdullilah Fırat, da-xuyand ku kesen xwedî rûmet û şerefyar nabin cerdevan. Fırat gotina xwe wiha domand: "Di destê kesen şerefyar de çek tune, yê çekdar zilmê li kesen bêcek dikin, lewma ew qas koçberî çedibe."

NÛÇE

Dewlet ketiye buhrana ehlaqî

Li gorî Tarık Ziya Ekinci di deh salên dawîn de hin kes bi çalakiyên nehêni hatine peywirdarki in. Ekinci dibêje: "Heke dewlet di nava xwe, an jî di bin baskên xwe de ji bo karê nelirê hin koman bi rî bixe, tevî wan hin çalakiyan pêk bîne, kesen ku van karan dikin, karin ji bo xwe jî hin çalakiyan bikin."

Kêm bûyer hene ku du hefteyan li ser hev di rojve de dimînin. Piraniya bûyerêni bi vî rengi li ser daxwaza rayedarên dewletê têni aferandin û li rojve de têni hiştin. Lî bûyera ku roja 3'ye sermawezê qewimî, hefteya çûyi di rojeva Tirkiyeyê de ma. Her weki nirxandinê li ser bûyerê, li ser vê yekê jî nirxandinê cur bi cur hatin kirin. Li gorî hinekan edî raya giştî ji bûyerêni bi vî rengi kerixiye, lewre jî çapemeniyê qulpêni ku bi dest xistine bernade. Li gorî hinekan jî MİT li pişt çapemeniyê ye, ew cesaretê dide patronê rojname û tv'yan.

Piştî bûyerê bi hefteyekê, Wezîrê Karê Hundîrîn Mehmet Ağar istifa kir, an jî li gorî nirxandina hinekan, Tansu Çillerê ew feda kir. Lî li aliye din ew çû li nexweşxaneyê Sedat Bucak ziyaret kir. Piştî ziyaretê jî pesna Bucakan da, ku çawa li diji PKK'ê ser kirine. Paşê jî wê idia kir ku li başûrê Kurdistanê hêzên tirk avetiye ser şikeftekê û Öcalan bi zorê ji destê wan xelas bûye, lê gelek fermandarên dora wî hatine kuştin. Ev gotinê Çillerê derew derketin, serkaniya giştî ya artêşa tirk da zanîn ku haya wan ji bûyerek bi vî rengi nîn e. Ev gotin weki hewla ni-xamtina bûyera çeteyan hate şirovekirin. Li aliye din xwendevanê ku xwestin roja 6'ê sermawezê YÖK'ê protesto bikin, ji polisan lêdaneke xedar xwarin, ew jî weki hewla rojevguhertinê hate binavkirin.

Digel çapemeniyê, partiyêni siyasi jî ev bûyer ji rojeva xwe dernexistin. Bi taybeti Serokê ANAP'ê Mesut Yılmaz diyar kir ku di destê wî de, hin belge hene û got: "Ewletiya ku kesi nîn e; rîxistineke mezîn hatiye avakîrin; ew pêsi weki alternatifî MİT'ê hatiye avakîrin, lê niha ji bo hin siyasiyan dixebe."

Generalê MHP'yi

Nameyeke ku bi îmzeya "Polisân Welatparêz" di hejmara 483'yan (22 rezber 1996) a rojnameya Aydînlîkê de

derket, têkiliya çete û şerê qirêjî dide dest. Li gorî vê nameye ev rîxistina nehêni ji polis û leşkeran pêk hatiye. Tê gotin ku serkêşîya rîxistinê digel Mehmet Ağar, Fermandarê Şerî Taybet Kemal Yılmaz û Yarbay Korkut Eken dikin. Navê Berpîrsê Timê Taybet Kemal Şahin jî di nameye de derbas dibe. Di nameye de tê gotin ku Kemal Yılmaz endamê MHP'ê ye û weki serkanê pêşerojê, lê tê nihertin. Her wiha bi awayê ku name dide zanîn Behçet Cantürk bi ferma-na Kemal Yılmaz û Mehmet Ağar hatiye kuştin. Di vê nameye de Abdullah Çatlı weki hevalekî nêzîk û Mehmet Ağar tê binavkirin. Tê gotin ku Çatlı digel polisan tâhsîlatê dike. Weki nimûne revandina Mehmet Ali Yaprak tê nişandayın. Di vê bûyerê de Çatlı digel polisên çalakiyên taybet Oğuz, Haluk, Ayhan, Semih, Ömer, Alper bazırganê eroînê Mehmet Ali Yaprak li Entabê li ber mala wî direvînin, paşê miqabilî 50 mil-yon dolar wî serbest berdidin. Her wiha li gorî peymana di navbera wan de, wê M. Ali Yaprak her meh ji firotina 'hapen koptagon' milyonek dolar bide wan.


Di nameye de Mehmet Ağar û Kemal Yılmaz weki berpîrsê kuştinê failî meçhûl ên li Silîvan û Batmanê û gund şewitandînen li herêma Dêrsim û Mûşê tê destnîşan-kirin. Tê gotin ku Kemal Yılmaz bi xwe li şewitandina gundan temâse kiriye û bi darê zorê bi gundiyan propaganda MHP'ê da-ye kirin. Dîsa name dide zanîn ku têkiliyên van her du kesan bi Tansu Çillerê re xurt in, lewre jî pe-reyêni ji bo xwe pêwist ji 'kana nehêni' kişandine; her wiha di hilbijartînê herêmî yê 27'ê adarê de jî, ji bo MHP û DYP'ê xebitîne.

Sêwîrkarê Ağar: Çatlı

Li aliye din hefteya çûyi der barê Abdullah Çatlı de agahîyen balkêş derketin holê. Li gorî gotina Mebûse CHP'ê Mustafa Kul, Hüseyin Kocadağ jê re gotiye ku Abdullah Çatlı her roj li meclîse ye û weki sêwîrkarê Ağar kar dike. Dîsa diyar bû ku ruhsata çeka Çatlı bi îmzeya Ağar hatiye dayin. Her wiha li ser Kocadağ û Çatlı madeyeke ku dişibe eroînê derket.

Digel ew qas gotûbêjan, Bucakan bêdengiya xwe parastin. Ji bo ku kes bi ser de neçe, Sedat Bucak hafizeya xwe winda kir. Her weki Serokê HADEP'a Ruhayê Reşit Yardımcı dibêje, hê jî li Ruhayê hemû ihaleyên dewletê li ser navê Bucakan tê standin û li aqûbeta kesen mîna Nazîm Babaoglu nayê pîrsîn ku di 17 saliya xwe de ji aliye Bucakan ve hate windakirin. Babaoglu ji ber ku li ser karê Bucakan ên pîs, weki çandina kinfê nûcê amade dikir, hate windakirin.

Nirxandina Tarık Ziya Ekinci ya li ser vê bûyerê, rewşê baş tîne zimên. Li gorî Ekinci di deh salên dawîn de hin kes bi çalakiyên nehêni hatin peywirdarkirin. Ekinci dibêje: "Heke dewlet di nava xwe, an jî di bin baskên xwe de ji bo karê nelirê hin koman bi rî bixe, digel wan hin çalakiyan pêk bîne, kesen ku van karan dikin, karin ji bo



xwe jî hin çalakiyan bikin."

Tarık Ziya Ekinci balê dikişine ser kuştinê li Kurdistanê û dibêje: "Bi deh hezaran kes hatine kuştin, lê berpîrsen van kuştinan nehatine girtin, tevî ku di dest de gelek delîl hene." Ekinci vê yekê mîna nişana parastina kujeran bi nav dike û piştre jî mînakekê dide: "Li sîuka sanayıyê ya Seyran-tepeye Amedê hembajariyeki min i Licî bi navê İsmail, tevî du kurê otobusa xwe tamîr dikir, du erebeyen emniyetê hatin ew girtin bin çav û kurê wî plakaya erebeyan girtin. Piştî du rojan cendekê wî hate ditin ku lê işkence hatiye kirin." Li ser hewlînan Ekinci Emniyeta Amedê dipejirîne ku ew plakayên erebeyen wan in, lê dibêjin: "Dibe ku hinekan ew teqlît kiribin." Ekinci, dide zanîn ku bi tenê di nava salekê de, 1100 dosyayê failî meçhûl hatine ber DGM'ya Amedê.

Rewşenbirê kurd Tarık Ziya Ekinci, bi bîr dixe ku di demeke kurt de bi dehan çete derketinê holê û dibe ku hejmara çeteyan bi hezaran bin. Ew dibêje: "Birayê min Parêzer Yusuf Ekinci jî ji aliye çeteyekî ve hat kuştin, tevî gelek delîlan jî, berpîrs nehatine girtin." Li gorî nirxandina Ekinci, dewleta tirk ji ber şerê qirêjî yê ku ev 12 sal in dimeşine, xurufiye; ketiye nava buhraneke ehlaqî.

Li gorî nirxandina Ekinci, meclîs jî newêre bi ser meseleyê de here, lewre di partiyê tirk de serdestiya serokan heye û ew jî di bin destê rayedarên nedîar de ne. Ekinci, sistema siyasi ya tirk ji weki "rejîma pêkutiyê ya bi dirûvî demokrasiyê" bi nav dike.

S. BERBANG

Lêborîn û rastkirin



Di hejmara me ya 40'an de, di rûpela sisiyan de, di şûna Güler Otaş de wêneyê keseke din hatiye weşandin. Em wêneyê wê yê rastîn diweşînin.

Güler Otaş

Gimgim

Navçeya me li pişt Çiyayê Gola Hezarê ye û li ser Deşta Gimgi-mê ye. Çiyayê Gola Hezarê çar hawîrdorê wê pêçane. Gimgi-mê hemû mîrû û zevî ne û Çemê Sûsê ji serê Çiyayê Gola Hezarê ji cil kaniyan tê, li derdora navçeyê digere û xwe digihîne Çemê Mûradê. Navekî din ê navçeya me ji Warto ye, navçeyê aliye Sumeriyan ve hatiye avakirin. Zivistanê carinan bi metroyan berf dikeve, havînan pir germ e û ava Çemê Sûsê pir kêm dibe. Lî dîsa ji her demsalê rewşa navçeyê bi awayekî xweşik e.

Beranberi Çemê Sûsê û Ava Xoşanê hemû darêne bî ne. Havîn û zivistanan, di çem de masî kêm nabin. Li rojhîlatê navçeya me Girê Sedo heye, ev der heyanî salêne beri Şerê Dînyayê yê Duyemîn ji warê navçeyê bû. Li ser vî girî kaniyek heye ku ava vê kaniyê mîna keşayê sar e.

Dema ku ribêz derdiketin an kereng-nebî, em hemû zarok kom dibûn û diçûn ser Girê Sedo. Ji ber ku li vir ribêz û kerengnebî pir bûn û heya dawiya meha gulanê ji diman. Li rojavayê navçeya me Çiyayê Gola Hezarê pir bilind e û li ser wê bi dehan war û zozan hene. Girê Goşkarbaba ji, ji girikên Çiyayê Gola Hezarê ye. Li vir tirba şehî-dekî heye ku navê wî Goşkarbaba ye û ev tirb di nav gel de pir pîroz e. Biçûk û mezin, dema birûskan vedidan digotin ku 'Goşkarbaba disa hêrs bûye'. Dema yekî tiştek bigota û kesî jê bawer nekiribûya digot, "Eger wer nîn e Goşkarbaba li min xe", an nexweşiyek hebûya, yan ji zarokê kesekî nebûya, diçûn ser Tirba Goşkarbaba jê alîkarî dixwestin û li gorî gotinan ji, kî ku çûye ser Goşkarbaba di dawiyê de xwesteka wî/wê bi cih hatiye.

Li ber Çemê Sûsê û li bîniya Girê Sedo girekî din heye, kevirê vî girî mezin in û pir nerm in û mirov dikare bi destan belav bike. Navê vî Girê Kere ye û navê kevirê wî ji Kewke ye. Li rojavayê Girê Kere, Girê Kerdiskê heye û li ser vî girî şikeftên gelekî mezin hene ku li ser van şikeftan pir çîrok têne gotin. Wekî tê gotin, di van şikeftan de cin hene û rojîn îniyan sûsek mezin çedîkin, di vê sûkê de tiştên pir xweşik û giranbuha henê, lê ci hîmet e ku heya niha kesê ku çûye vê sûka cinan, tu tiş bi xwe re neaniye. Li rojavayê bakur meydaneh heye, ji dîrokeke pir kevn û vir de li vir hespên rehwan li ser bazdan, ji ber vê yekî navê vir Meydana Hesbazdanê ye (Gel dibê cihê Koşiyê). Li vir heya sala 1965'an ji cirît dihat listikandin.

Rojekê ez û zarokê taxa me em tev bi hev re çûne ser Girê Goşkarbaba ji bo ribêsa. Heya em hilkişîyan û derketin serê gir, baranê dest pê kir. Ji ber ci-bû ez nizanîm, lê ziravê min ji baran û birûskvedanê diqetiya. Ez di cih de qu-



tifim û min xwe avêt ku em bi şûn de bizivirin, lê kesekî guh neda min. Her ku birûskan vedidan û ronahî dihat çeven min, ji min kirî ku Goşkarbaba şimaqekê li rûyê min dixe û her carê heyanî ku dengê min derdiket ez diqiji-yam. Wê rojê ez bi tirs û bî xof, bi ketin û bi rabûn heyanî malê bi reva rev hatim. Dema diya min di vî halî de ez dîtim, got:

— Ci bû berxê min, kî li te xist, cinan daye ser piştâ te?

Ji ber işke işkan, min nikaribû qise bikira. Bi tenê, ji devê min ev pirs derketin

— Goşkarbaba da dûv min.

Diya min pirqîn pê ket, keniya û got:

— Hey kurê min, kî ci zane ku ev çend hezar sal e Goşkarbaba mirî ye. Ku zindî bûya wî ji wê ji te hez bikira, ji ber ku tê gotin; wî emrê xwe di riya mirovahiyê de derbas kiriye. Ew ji mirov xayîn û ne baş hez nake. De wer cem dayika xwe, nebe ku ji vir û şûn de tu ji Goşkarbaba bitirsî. Ez bi qurban, berkê min, tu fîr bûyi?

Bi rastî ji ez ji wê rojê bi şûn de ji baranê û ji birûskvedanê êdfî netirsi-yam. Lî hîn-jî, dema ku birûsk vedide ez di dilê xwe de dibêjim: 'Goşkarbaba li xayînan dide'.

Li rojavayê navçeya me golek hebû, jê re digotin Gola Bêbinî. Li gorî gotinan binê vê golê tune ye û ci bikeve vê golê, careke din jê derkeve. Wekî hemû dayikên zarokan, diya min ji tim digot: "Nebe nebe tu ber bi Gola Bêbinî ve heri. Têde cinawir hene û ew kî bigirin dike loqek û dadiqurtîne" bersiva me zarokan ji ez bawer dikim wekî hev bû; "Na dayê tobe, ez ber bi wan deran de naçim." Lî tiştên qedexe û dijwar, bêhîtir bala mirovan û bi taybetî ji bala zarokan dikşînin. Rojekê li bîniya lodan, zarokê taxa jê em hemû li hev kom bûbûn. Remzo got:

— Zarokino, iro hewa pir germ e, ka

em herin aşperiyê (avjenî).

Zarokan hemûyan got: "Rast e" lê me nedizanî ku emê herin ku.

Sezo got:

— Li devê Çemê Sûsê genim dikelin, nahêlin em bikevin avê. Li Çela Gur, çemekî pir kûr û şîp heye, divê em herin cihekî din.

Miço got: Wekî werê ye, ka em herin Ava Xoşan.

Eno bi hêrs got:

— Kuro tu ci ker î, ne duh bû ku me li zarokê taxa jorîn xist, ku em herin wir, ewê me nerm bikin.

Miço bê deng ma. Hemû zarok fiki-rîn di dawiyê de qerara çûyîna Gola Bêbinî hat dayîn. Ji bo ku kes me nebîne, em di bîniya goma Apê Oso re daketin û di nav Mêrga Shin re û di ber Bejê Filelân re em bi bazdan çûn. Gava ku em gihîstîn cem Aşê Kamoyê File, Xalê Oço em dîtin. Wekî zanibû ku em diçin Gola Bêbinî, zivîrî û got:

— Law tolazên bêkar, nabe hûn herin Gola Bêbinî. Bilehî, hîn do cotek ga ket golê û têde wîndâ bûn.

Tevaya zarokan serê xwe hejandin, weki "em naçin" û em bi lez ji cem wî dûr ketin. Li dûv axaftina Apê Oço hînek zarok bi şûn de zivîrî. Em bi qasî deh zarokan di nav baxçeyê Kamoyê File re derbas bûn û beranberî zeviyan, me xwe gihand ber golê. Tevaya zarokan li hev dinêrîn û her kes li benda hev bûn ku kî ji me berê xwe tazî bike û bikeve golê. Gol wekî di xew de bû, pê-lek biçûk ji tune bû, lê li kîleka çepê ci-hek hebû mîna babîrûskî li derdorê xwe bilez dizivîrî û wekî kûr ve diçû û cihe wê wekî tendûrekê vedibû. Dema ku min ew der dît, ez bi şûn de vekişyam û min got:

— Lî binêrin, ev der wekî tendûrekê ye, kî bikeve vir, wê cinawirek derkeve û wî bixwe.

Remzo hêrs bû û bi şer min de hat:

— De wir de here tirsonekê newêrek,

tu ji kuzanî, tu here bi qîzan re bilize.

Min bi baweriyeke mezin bersiva wî da:

— Diya min got, ma te nebihiş demek berê xalê Oço ci got?

Lî zarokan guhdariya min nekir, li dûv Remzo yek bi yek xwe tazî û rût kîrin û ketin golê. Bêhnek derbas bûbû nebûbû ku qîjînî hat. Qaso hewar dikir û serê wî geh diket bin avê û geh jî derdiket. Min di cih de bazda, heya mala Meta Almasê reviyam. Heta ji min dihat, min bi dengekî bilind hawar û gazîda, bawer im dengê min û wê rojê gihîstibû hemû navçeyê. Wekî yekî bi kêreke tûj goşte min jêdir, "Hey medet bi-revin Qaso di golê de dixeniqe". Çend xort bi dengê min re ber bi golê revyan. Heya ez careke din çûm ser golê, xortan Qaso xilas kiribûn, lê ji ber ku pir av daqurtandibû ji xwe ve çûbû.

Ji wê rojê bi şûn de zarokek ji ji taxâ me ber bi Gola Bêbinî nema çû.

Li navçeya me, ne tenê Gola Bêbinî hebû. Li rojavayê wê, li bîniya gundê Alingozê sê golên pir xweşik hebûn û ev gol bi avê xwe nexwes şifa dikirin. Nexwes diçûn diketin wan golan ji bo ku ji nexweşîyan pak bibin. Xîcê li devê golan, ji bo çîpênu ku jan têde, pir rind bûn. Ewênu ku bawî bûn, çîpênu xwe dixistin nav xîcikên golê. Havîn û zivistanan, derdora van golan şîn bû, ji ber ku avê van golan pir germ bûn. Zivistanê her der bi berf bû, lê dora golan heşinayî bû.

Havîn xelkê navçeyê hemû, çend caran diçûn ser van golan. Berî du rojan, ji bo çûyînê xwe amade dikirin. Tolme, kifte, borek, nanê sêlê, helaw, mirîşkên kelândî û fêkiyên demsalê ci ku hebûna bi xwe re dibirin. Ji serê sibê heya ku roj biçuya ava, li ser golan disekinîn.

Tehma çaya ku li ser agirê ezingan çedîbe mirov li tu deran nabîne. Ev roj bi piranî ji, ji bo keç û xortan xweş bû. Ên ku dilê wan di hev de hebûn, li bin darêne bîhan hev didîtin, dihatin cem hev. Hinek ji jînê navçeya me ji, hemû karê wan çêkirina navbera xort û keçan bû. Keç û xortan, pîri caran li ser golan govend digirtin û stran diavêtin ser evîndara xwe.

Me zarokan ji xwe tazî dikir û bêbehînvedan, heya çûyînê di golan de me dilîst. Min ji wan golan pir hez dikir, gelo çîma, ez hîn ji nizanîm. Diya min dema karek ji min bixwesta û min nekira, digot: "Welehî sibê Zelîxan û hevalîn xwe diçin ser golan, ku tu wiha bîkî ez te naşînim". Ez bi vê gotinê her car dixapiyam û her ci kar bigotana min dikir.

Xwezila dinya tim bi qasî dinyaya zarokan paqî û bêguneh bûya û navçeya me wekî wan rojan germ û xweş...

Hejmara nû ya Jiyana Rewşen

Hejmara duymen a Jiyana Rewşenango ya meha sermawezê derket. Wekî tê zanîn Kovara Jiyana Rewşen berhemeye Navenda Çanda Mezopotamyayê ye.

Di vê hejmara xwe ya nû de Jiyana Rewşen, wêneyê Cegerxwîn di berga (qapaxa) xwe de bi kar anîye. Ev nivîs a bi sernava "Şâirê Bêsinor ê Çar Perçeyan" ji aliyê Müslüm Yücel û Amed Mahsûm ve hatiye nivîsin. Di vê nivîsede bêhtir li ser jiyan û huner û helbestvaniya Cegerxwîn hatiye sekînîn.

Lê pêdivî heye ku mirov li ser sernava vê nivîsê bisikine. Bi rastî min ji gotina "Şâirê Bêsinor ê Çar Perçeyan" tiştek fêm nekir. Gelo nivîskar dixwazin ku bibêjin "Şâirê ku sînor li ber berhemîn xwe danayne", an "Şâirê ku sînorê çar parçeyên Kurdistanê nas nake" an ji "Şâirê ku ji her aliyî ve sînorînas"!..

Di vê nivîsê de tiştekî din jî ku gelebalkes e, bala min kişand: "... dipirsin û paşê li quncikekî serê xwe dixine nava derpiyên xwe, kûr kûr difikirin" (!) Min fêm nekir, gelo mirov çawa di nav derpiyên xwe de kûr kûr difikirin?

Di vê hejmara nû de Zana Farqînî mijareke baş hildaye dest; "Der barê Terimîn Muzîka Kurdî de". Ji sernava nivîsê jî tê fêmkirin ku Farqînî, xwendevanan der heqê muzîkê de agahdar dike.

Yek ji nivîsîn vê hejmara jî nirxandi-



na filmekî tirkî ye. Ev film van rojan di sînemayan de tê nîşandayîn; "Işıklar Söñmesin" (Bila ronî netemirin).

Di sergotara kovarê de tê gotin ku, "nivîsa me ya yekemîn (yanê ya bi tirkî) ji aliyê hunermendên beşa sînemayê ya NÇM'ê Berfin Derman ve hatiye nivîsin." Wisa tê fêmkirin ku ev nivîs bi awayekî kolektif, ji aliyê beşa sînemayê ve hatiye nivîsin.

Îcar li gorî min di nivîseke bi vî rengî ya nirxandinê de divê îmzeyek hebe û ew kes jî, ji nivîsa xwe berpîrs be. Ji ber ku her kes xwedî nirxandineke taybet e. Dema li filmekî an jî li tiştekî din were temaşekirin, her kes wê li gorî ditina xwe, wê mijarê binirxîne.

Di vê nivîsê de tişte herî balkes ev e ku, wekî ku di vî filmî de her tişt negatîf û xerab bin, nêzîkî tê hatiye dayîn. Lê teví hin kemasî û xeletiyan, gelek însanîn ku li vî filmî temaşe kirine, hîc bi vî rengî nanirxîn.

NUR-HAYAT


Bi kurdî toreya biyan

Kovareke nû, gava xwe ya yekemîn avêt qada toreya kurdî. Navê vê kovarê "Nûdem Werger" e. Her wekî ji navê wê ji tê derxistin, ev kovar li Swêdê ji hêla kesen ku Kovara Nûdemê derdixin ve tê weşandin, ew kovareke salane ye û bi nivîsîn werger tê dagirtin.

Her wekî Kovara Nûdem, xwedî û gerînendeyê Nûdem Werger jî Fırat Cewerî ye. Dîsa gelek nivîskarê kurd ên ku em ji Kovara Nûdemê nas dikin, ji vê kovarê re jî nivîs wergerandine. Fırat Cewerî bi pêşkeke kurt li ser pêdiviya kovareke bi vî rengî radiweste. Cewerî pirsa bi rengî "Ji bo ci kovareke nû" ku di pêşgotina piraniya weşanîn nû de tê bersivandin, bi awayê "Ji bo ci ne kovareke nû?" dibersivîne.

Cend nivîsîn balkes ên ku di hejmara yekemîn a Nûdem Werger de cih girtine; "Çin û Edebiyat" (Ivar Lo-Johansson) li ser edebiyata karkeran e, "Şahê Kemalî" (Birgitta Bergman), "Çima kompüter nikarin pirtûkan wergerînin" (Peter Gardenfors), "Çêxovê herdemi" (Sofia Grigoryeva) û çîroka bi navê "Ji wan re bibêje bila min nekujin". Di kovarê de nivîsa bi navê "Ji rûpelên nenaskirî yê rojhilatnasiya polomî" û nivîsa bi navê "Di tarixa Teberî de kurd" hêjayî pesnê ne. Lê çewtiyên tewandina navdîran û bikaranîna cînavkan hêjahiya nivîsa duymîn kêm dikin.

SAMÎ BERBANG



Li aliyê din di vê hejmara de hin kemasî ji balê dilişin. Her çiqas di kovarê de ji sê çar zimanî werger hebin ji, piraniya nivîsan ji swêdî û tirkî hatine wergerandin. Ji hêla hejmara kadroyan ve jî teng xuya dike. Di vê hejmara de ji bîlî pêşgotinê du wergerên Fırat Cewerî, du wergerên Felat Dilgeş, dîsa Süleyman Demir û Zinarê Xamo bi du wergeran di kovarê de cih digirin.

Li aliyê din mirov li hin nivîsan asê dibe, nikare pêde here, ji ber ku werger ne rawan e. Ji bo vê mirov dikare, nivîsa ku Beyhanî Şahîn û Şahînê Bekirê Sorekli wergerandine wekî nimûne nîşan bide. Li aliyê din di nivîsa Yaşar Kemal "Mirovîn Şikeftan" de ku ji hêla Felat Dilgeş ve hatiye wergerandin hînek çewtiyên rîzimanî hene. Bo nimûne: "Van şikeftan di wextê de ode bi ode bi destan çekirine ne wusa?" Li vir cînavka îşarkî ne di cih de ye, diviyabû bi awayê "Ev şikeft di wextê de..." bûya.

Kî, ji kê, ci dixwaze?

DILBİXWÎN DARA



Di rojnameya Ronahî de ku car caran ez wê dixwînim, hejmîr (63), "nivîsek" di bin navê Qaso Laleş de hatibû weşandin. "Nivîsê", ji ber "pêwîstiya" xwe cihekî fireh girtibû.

Di nivîsa xwe de birêz Qaso, çavên xwe digire û devê xwe videke, hema ci tê ber devê wî dibêje, pir li encamê nafikire.

Qaso, hem xwe xwedî, hem jî xwe avûkatê nivîskarê kurd ên li Swêdê dibîne. Tiştekî pir baş e dema ku mirov xwedî li nivîskarê xwe derkeve. Lê belê divêNEYE jîbîrkirin ku hînekîn din hene, ji mirov bêhtir di pratiqa xwe de, di xebat û çalakiyên xwe de, xwedîtiyê dikin. Eger niyeta Qaso ew be ku hezkirina di nava me de, qels û xerab bike ew tiştekî din e. Lê belê, ez bawer dikim Qaso bi niyeteke pak hînek tişten şas dibêje.

Ez her dem dibêjim, xizmeta ku nivîskarê kurd ên li Swêdê pêşkêş kirine, gelekî mezîn e. Ev nayê înkarkirin. Ji ber vê yekê jî dî nivîsa xwe de ya ku di rojnameya Özgür Politika de hatibû weşandin, min hînekî xebata li wê derê

rexne kiribû.

Bi rexnegirtinê mirov nabe dijminê hev. Di rexnegirtinê de, hevxurtkirin, hevalî, dostanî, bipêşxistin û jihevhezkirin heye. Em çiqasî hev rexne bikin, ewqasî jî em ji hev re dibin alîkar. Çiqasî jî em li hemberî kemasîyên hev bêdeng bîmînîn, ewqasî em riyên kemasîyan ji hev re vedikin.

Diyar e ku birêz Qaso rexnegirtinê wekî heqaretekê dibîne, ev jî tiştekî pir şas e. Eger ku Qaso berî binivîsanda, hînekî xwe li ser mijara rexnegirtinê kûr bikira, wê baştır bûya.

Hînek rastî hene, divê mirov wan bide ber çavên xwe. Ci ne?

Gelek nivîskarê me li Swêdê winda bûne, yan jî xwe winda kirine. Gelek serokên rîexistin û partîyan bûne Pizzacî, lê belê gelekan jî xwe bi germahiya welat parastine, kesek nikare vê yekê înkâr bike. Ji hemû welatîn din bêhtir, li Swêdê îmkan hene ku mirov xwe bi tenê bibîne, îzole bîne û nikaribe ji çar kesan re çar gotinan bibêje. Hînek nivîskarê me jî, parek ji van kemasîyan hilgirtine. Dema ku di vê çarçoveyê de rexneyek hate kirin, divê mirov xwe teng nekê. Eger birêz Qaso, vê jî bizanibe baş dibe.

Ez pir dirêj nakim. Dixwazim gotinekî li ser "rexneya" der heqê Özgür Politikayê de jî bibêjim.

Birêz Qaso Laleş rojnameya Özgür Politikayê dixe bin sîceki giran û wiha dibêje, "ew ne rojnameyeke demokratik e, xwendevanan teşwîqi kemaîzmî dike û ekere bang

dike, ey xwendevan bi kurdî nexwîne û hîni tîrkiya Stenbolê bibe..." îthameke giran e.

Ez ecêb dimînim. Ji ber ku mirov ancaz dikare sîceki wisa bavêje ser rojnameyeke wekî Hürriyetê. Diyar e ku birêz Qaso Ö. Politika terepaş nas dike. Ji ber ku Ö. Politika heyâtu dibêjî, rojnameyeke demokratik e. Hevalîn ku têde dixebeitin meqes nexistine desten xwe û li zimanî nagerin ku qut bikin. Talîmat û emir nedane kesekî û negotine "tu mecbûr û wisa binivîsîn". Ew ji azadiyê natirse, hacet nake ji ku meqesan bi kar bîne û li pêşîya azadiyê têlan danayne.

Ö. Politika wekî hînek rojnameyên din ne feqîr e. Ew di nav dewlemendiya gel de diji.

Ji bo zimanê Ö. Politika jî, ku Qaso careke din xwe şas dike û rexne dike ku ew bi tirkî tê weşandin. Ev jî rexneyeke ecêb e. Çîma?

Ö. Politika rojnameyeke kurdî ye, bi zimanê tirkî tê weşandin. Hacet nake ku ez sedera vê yekê şîrove bikim. Madem wisa ye, bêguman wê bi tîrkiya modern binivîsîne. Ez nizanim, ma birêz Qaso ji Ö. Politika dixwaze ku bi tîrkiya Osmanî binivîsîne?! Herhal Ronahî bi tîrkiya gundê me naniwîsîne. Ev nîrîneke pir teng e, ne ciidî ye jî, hacet nake em li ser munaqeşe bikin.

Bi rastî min nedixwest ez nivîseke wiha binivîsînim. Mijarîn pêwistir hebûn.

Xwezî birêz Qaso jî, ku ez wî nas nakim û min navê wî jî nebîstibû, xwezî serê xwe bi vê pîrsê re neêsandibûya.

Xwezî Ronahîye jî, li şûna wê nivîsê, nûcîyeke gerîla biwesanda... Çiqas baş dibû!

Hezkirina Apê Mûsa ya ji sewalan



Apê Mûsa
mirovekî
dilovan,
jîndarbez,
diltenik û saxî
bû. Bi qasî ku
hez ji
mirovan, welat
û nîstimana
xwe dikir,
hinde jî hez ji
sewalan dikir.
Hez ji gul û
kulîkan jî
dikir.

Apê Mûsa mirovekî dilovan, jîndarbez, diltenik û saxî bû. Bi qasî ku hez ji mirovan, welat û nîstimana xwe dikir, hinde jî hez ji sewalan dikir. Hez ji gul û kulîkan jî dikir. Ku derfetên wî hebûna li mala xwe sewal xwedî dikirin.

Kûçikeke wî hebû, navê wê Kejê bû. Ji celebê kaniş, manendî berxikeke reş bû. Zehf jîr û zîrek bû. Kejê bi girêbayê (kanserê) mir. Dû re Irma jê re anîn. Irma seyekî res, girs, mîna hirçekê bû. Pisikeke wî hebû, ji celebê Wanê, mîna hêkê spî, çavek zer, yek jî şîn bû. Navê wê jî Gulo bû. Zehf zîrek bû. Li mala xwe ya li Stenbolê ancax dikaribû van xwedî bike.

Piştî 12'ê rezberê (îlonê), kulfetê wî gişk li Swêdê bûn. Bi tenê mabû, nema sebra wî li Stenbolê dihat, rabû hat welêt. Li gundê Stilîlê bi cih bû. Ji aliye din jî birayê Hesen çûbû dilovaniya xwe, hilanîn û danîna zeviyê Zivingê ketibû stûyê wî. Anglo li Stenbolê sebra wî nedihat û di heman

demê de karê wî li welêt hebû.

Ji bo xwedîkirina sewalan derfetên wî fireh bûn. Bizin, keyok, kergoş, qaz, werdek û mirîşk xwedî dikirin. Her wext di nav wan de bû, bi wan re dipeyivî û mijûl dibû. Kêfa wî pir ji sewalên wî re dihat, xwarin û vexwârina wan didan, êvarê gişk bi cih

Gelek caran ku ez diçûm Stilîlê dîtina wî, kes li dora wî nîn bû, tik tenê di nav kulîkan de û li nav baxçeyê xwe rûniştibû, sewalên wî jî li derdora wî bûn. Dû re gundî li dorê dicivîyan. Civat saz dibû, dest bi pêkenok, qerf û henek û tinazan dikirin.

kêrî tiştekî din nayê.

– Ez dibêjim, ji mijûlbûna van sewal û kulîkan wexta te namîne ku tu bi gundiyan dakevî. Ev ci sewal in te li xwe vehewandine? Ji dêla ku tu bi van sewalan dakevî, bi mirovîn derdora xwe dakeve. Ci ji kergoş, mirîşk, werdek û kevakan tê?

Gorbihuşt, bi bêhneke fireh wiha li min vegerand û got:

– Doktor, bi Xwedê ev sewalên min ji gelek mirovan çêtir in. Zehf sernerm in û bi ya min dikin. Sewal in, lê dîsa dijrabûnê li peyva min nakin.

Ewê tu dibêjî serhişk in, ez dikim û nakim tiştek naakeve serê wan. Ma ku bi ya min kiribûna, ji bona ci ez dê bi zarok û sewalan daketima? Tu sebra min li wan nayê. Bêhna min bi van kulîk û sewalan derdikeve. Ne ji wan bûya ezê biteqiyama, roj û danekî li virê nedimam. Bi serê te, li vir hevalê doza min zarok û ev sewal in. Bi van kulîk û sewalan, ez piçekî kul û derdan ji bîr dikim.

Î. OMERÎ

g elek caran ku ez diçûm Stilîlê dîtina Apê Mûsa, kes li dora wî nîn bû, tik tenê di nav kuîkan de û li nav baxçeyê xwe rûniştibû, sewalên wî jî li derdora wî bûn. Dû re gundî li dorê dicivîyan. Civat saz dibû dest bi pêkenok, qerf û henek û tinazan dikirin.

dikirin, gelek li wan miqate bû.


Gelekîn wan bi nav bûn. Bangî kîjanê ji wan dikir, ew dihat nik wî. Bi wan şad dibû.

Dema ku mîvanên wî dihatin, sewalên xwe bi wan didan nasîn. Bi bêhneke fireh pesnê wan dida. Lê mafê wî jî hebû, lewre sewalên wî bi esil û navdar bûn, giştan bi ya wî dikirin; sernerm û mütfî bûn. Bi kurtaşı heval û hogirên wî bûn.

Rojekê min jê pîrsî û axaftinê li jêrê di navbera me de derbas bûn:

– Xalo her ku ez têm ba te, dibînim ku tu bi tenê yî, tu kes li dora te nîn e. Piştî ku ez têm, gundi dicivîn. Qey meseleyek di navbera te û gundiyan de heye?

– Na, bi tirba xalê min û bi serê te, tu mesele di navbera min û gundiyan de nîn e. Ez wan nahewînin. Ma wê bên cem min ci, ji quretiyan pê ve bi



● 22.11.1908: Kurd Teavun ve Terakki Gazetesi (Rojnameya Alîkarî û Pêşketina Kurd) li bajarê Stenbolê dest bi weşanê kir. Ev rojname wekî weşana Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd jî tê eşkerekirin. Xwedî û berbirse rojnameyê Tewfîqê Sîlêmanî ye. Rojnameyê hem bi kurdîya Bakur, Başûr û hem jî bi tirkî weşan kiriye.

Sernivîskarê rojnameyê Ehmedê Cemîlê Diyarbekirî ye. Di hejmara rojnameyê ya pêşin de nivîseke Mele Seîdê Kurdi cih girtiye, nivîs wiha dest pê dike:

"Ey gelî kurdan, îtîfaqê de quwet, îñhadê de heyat, di biratiyê de seadet, hikûmetê-de selamet heye".

Nivîsên wekî "Kurd û Kurdistan", "Pêwest e zarokê kurdan bi

zimanê bav û bapîrêne xwe bixwînîn", "Ji bo azadbûna Kurdistan pêwestî bi damezrandina eskerekî kurdîyê mezin heye" jî tê de hene.

● 21.11.1994: Rojnameya Welatê Me dest bi weşanê kir. Rojname hefteyî bû, Ji 16 rûpelân 4 rûpelân wê jî rengîn bûn. Rojnameyê di rûpelân xwe de cih dida nivîsên li ser mijarên siyâsî, nûcê, çand, gîrok, huner û edebî û hwd.

Welatê Me tevî hev 46 hejmar derkel. Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (IDGM) der barê pênc nivîsên ku di hejmara 4, 5 û 6'an de derketibûn, ceza dan Xwedî İmtiyaz û Berpirsê Karê Nivîsarê vê rojnameyê. Doz niha li Dadgeha Billind (Yargıtay) in.

AWIR

Xelata Aştiyê dan Eşber Yağmurdereli

'Ew bi dilêne xwe ji me çêtir dibînin...'



Di Fûara Kitêban a Panzdemîn (TÜYAP) de Weşanxaneya Çınarê Xelata Aştiyê ku ev du sal e li ser navê nivîskarê navdar Rıfat Ilgaz tê dayîn, ïsal li ser kar û xebata wî ya aştiyê, dan Berdevkê Komîteya Aşîtwazan Eşber Yağmurdereli.

Di 7'ê sermawezê de li Salona Konferansê ya Sergi Sarayı ya Stenbolê, Weşanxaneya Çınarê bi merasîmekê xelata aştiyê da Eşber Yağmurdereli. Li dor pêncsed kesen aşîtwaz beşdarî merasimê bûn.

Dema Eşber Yağmurdereli tevlî xwe diyî Weşanxaneya Çınarê û kurê nivîskarê navdar Rıfat Ilgaz, Aydin Ilgaz derketin ser sehnîyê, wan kesen ku hatibûn merasimê nezîki deh deqîqeyan lî çepikan xist. Aydin Ilgaz, berî ku xelatê bide Yağmurdereli, axîv û di ahaftina xwe de mebesta weşanxaneyê ya ku ji bo xelatê çîma Eşber Yağmurdereli hilbijartine, bi van gotinan diyar kir:

"Rıfat Ilgaz hemû jiyana xwe di riya aşti û demokrasiyê de derbas kiriye. Hatiye girtin, di hepsan de razaye, lêdan xwariye, işkencê dîtiye, lê doza xwe ya ji bo aşti û demokrasiyê bernedaye. Karikaturist Semîl Poroy karikatureke wî çekiribû; di wê karikatûre de çavê Rıfat Ilgaz girêdayî ne, desten wî di kelemçeyê de ne, lê ew pêsiya xwe, riya xwe bi dilê xwe dibîne... Ev du sal e em li ser

navê wî Xelata Aştiyê didin. Ji bo xelata ïsal, me birêz Eşber Yağmurdereli hilbijart.

Lewre tevî ku çavên wî nabîn jî, ew bi salan li ser têkoşîna aşti û demokrasiyê di hepsan de razaye, işkence dîtiye û di vê riye de li ber xwe dide. Têkoşîna wî û bavê min dişibine hev. Çavên wî nabîn, lê ez bawer im ku ew jî bi dilê xwe her tişî dibîne û ji me tevan jî çêtir dibîne..."

Piştî ahaftina » we, Aydin Ilgaz Xelata Aştiyê da Eşber Yağmurdereli. Yağmurdereli jî li ser vê xelatê got ku lazim e her kesek ji bo aştiyê xebatê bike, lewre heta aşti çênebe, demokrasî jî çênabe; yênu ku di vî şerî de téne kuştin, ci ji vî alî û ci jî, ji wî alî, tev zarokê feqîr û belengazan in.

Yağmurdereli xwest ku her kesekî aşîtwaz ji ber xwe ve li kampanyaya "Ji Bo Aştiyê Milyonek İmze" xwedî derkeve û ci ji wan bê, bikin. Li dijî wan şerxwazên ku bi zor û bi hêza çapemeniyê dengê gel û mirovîn aşîtwaz fetisandîne, derkevin. Ku aşti çênebe wê gelê tirk û gelê kurd di nav xwînê de bixeniq...

Yağmurdereli li ser Xelata Aştiyê jî ev gotin: "Ji ber ku ev Xelata Aştiyê ku li ser navê nivîskar û ozanê mezin Rıfat Ilgaz didin, ji bo ku ez laîq dîtim, ez pir serbilind im..."

R. DILOVAN

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Di dawiyê de dewleta
mafya û kontr-gerîla
qirik da dest

J i 1984'an vir ve dewleta tirk bi plan û program, mafya lî dij dozâ kurdan bi rêxistin kir. Bi faşîstên MHP'yi dest bi vê xebatê kir. Di van mehîn dawiyê de çend bûyerên çeteyên mafyayî derketin holê ku êdî dewlet bi xwe nikare vah çeteyan veşêre. Wek bûyerên Alaaddin Çakıcı, Söylemezoğlu û yên ku li Hekarî Wanê bûn, şefîn polîs û serokên leşkeran di nav cemsâ û otomobile fermî de, bi kiloyan eroîn û çekên mezin hatin girtin. Ü bûyerâ herî dawî jî, ya parlementerê partiya Tansu Çiller DYP'ye serokê ceştan Sedat Bucak, şefî polîsan Hüseyin Kocadağ û qatil û serokê mafyaya dewletê Abdullah Çatlı ku di nav otomobilekê de bûn û qezaya trafîkî bi şer wan de hat. Bi vê bûyerê dewletê careke din qirik da dest û her tiş ekere bû. Bi vê eşkerebûna qezaya trafîkî re, serê mafya û kontr-gerîla gîhişt wezîr, serokwezîr, serokkomar û serokşerîn Tirkîyeyê. Bi vê bûyerâ hanê erdhej (bîvel-erz) li dewleta mafya û kontr-gerîla ket.

Wekî têzanîn Abdullah Çatlı ku çend roj berê di qezayeke trafîkî de mir, MHP'yi kevn û qatilê destbixwîn bû. Wî di sala 1988'an de 8 kesen Partiya Karkeren Tirkîyeyê kuştibûn. Qaço dewlet ji wê rojê ve li Abdullah Çatlı digere. Abdullah Çatlı bi pasaporta diplomat derdi keve der. Ew ji bo kuştina Papa Jî alîkariya M. Ali Ağca dike. Dewlet pişt re wezîfe dide Çatlı ku li derive hem li dij kurdan û hem jî li dij ermeniyan suîkastan pêk bîne û di navbera Tirkîye û Ewrûpayê de bazîrganîya bazmorfîn û eroyîn bike. Bi salan e ku Înterpol bi listeyâ sor li Abdullah Çatlı digere. Hûn li işe felekê binêrin, Abdullah Çatlı piştî çend salan di nav otomobile Sedat Bucak û şefî polîsan de, di qezaya trafîkî de bi şefî polîs û Gonca Us re dimire û Sedat Bucak jî bişîndar dibe. Bi navekî sexte pasaporteke diplomat li ser Abdullah Çatlı derdi keve. Pasaporta diplomat jî aliye Wezîrê Karê Hundirin ve hatiye dayîn. Di otomobilê de çekên gîran, cîhazên bêdengkirina çek hene û plakâyên sexte jî di hundîre otomobile xirbelos de têr dîtin.

Ji bo ku hîn bêhtir prestîja dewletê nekeve û şerî negîhiye hînek kesen din ên ku di pîleyeke bilind de dewletê idare dîkin. Tansu Çiller hîma li cih de Mehmet Ağar jî wezîfeyê kişand. Û got: "Ağar ne ji bo vê yekê ji wezîfeyê hatiye girtin, ew ji ber ku dema. Serokwezîr Erbakan cû Lîbyayê, qaramame imze nekiribû û ew li dij çûyîna Erbakan a Lîbyayê derketibû, min ew ji bo vê yekê ji wezîfeyê girt. Mehmet Ağar, wezîr û mirovelî herî qencê dewletê ye..."

Mehmet Ağar ne ku di dema wezîriya-xwe de ketiye nav karê mafya û kontr-gerîla, ji berê ve ew hîn dema ku cîgîrê midûrê emniyetê bûye ketiye nav vî karî. Pişt re ew bû midûrê emniyetê yê giştî, wê deinê Ağar bû serokê mafya û kontr-gerîla. Di vî warî de Soner Yalçın bi navê "Behçet Çantürk ve Anıları" (Behçet Çantürk û Bîranînê Wî) pirtûkek nivîsandiye. Di sala 1996'an de pirtûk du caran hatiye çapkirin. Di vê pirtûkê de têkiliyê dewletê, mafya û kontr-gerîla bi dokumentên zelal anîne ber çavên xvî endevanan. Di vê pirtûkê de mirov rol û wezîfeyen Ağar bi awayekî vekir û zeia dibîne. Soner Yalçın bi taybetî ji rûpela 224'an heta 227'an têkiliyên M. Ağar û nafiyayê bi dokumentan raxistiye ber çavan. Mal û milkên wî ci ne, ew li ser kî tapukirî ne, adres û telefonên wan yek bi yek dane. M. Ağar 18 xanî li ser jînxala xwe Şükran Akçadağ tapû kirine. Bi kurtahî ji mal û milkên M. Ağar re hed û hesab nîn e."

Îro hîn bêhtir zelal û diyar e ku kesen ku Behçet Çantürk, Savaş Han, Medet Serhat û hevalên wan kuştin, bi plan û alîkariya M. Ağar û Abdullah Çatlı û ew kar kirine. Dewlet bi pereyê mafyayê kontr-gerîla bi rêxistin û xwedî dike. Dewleta tirk û bûye çete, serokê koma çeteyen herî mezin yek jê mîrê Tansu Çiller, Özer Çiller e. Özer Çiller, bi alîkariya jîna xwe Tansu di qada navnetewîye de qaçaxtiya ûranyûm û osmiyûmê dike. Ji dewleten Sovyeta kevn tînin û li Rojhilata Navîn difiroşin. Wekî têzanîn çend hefta berê Înterpol li Antalyayê civiyabû û di rapora xwe de dabû diyar kirin ku, narkotika dînyayê %80 ji Tirkîyeyê derdi keve. Belê, dewleta tirk di nav xwe de bûye çete û mafyaya dînyayê girtiye destê xwe.

Nivîskar û weşanvan Erdal Öz: Mirov ziman qedexe dike?!



Karê Erdal Öz nivîs û weşanvanî ye, lê di nivîskariya xwe de jî, di weşankariya xwe de jî serê wî bi qanûnan re dikeve bîlâyê. Hatiye girtin, kitêbên wî têne berhevkirin. Ji xeynî nivîsên xwe, li ser nivîsên Yaşar Kemal jî ceza xwar.

Berî niha bi çend rojan yekîtiya weşanvaniya xelata azadiya ramanê dane Yaşar Kemal û Erdal Öz.

Em hevpeyvîna ku hevalê me RAHMÎ BATUR
pê re kiriye pêşkêş dikan.

We kengî û bi ci awayî dest bi nivîskariye kir?

● Di destpêkê de min ji edebiyatê hez nedikir. Belki sebeb ew bû ku min ji mamosiyê xwe hez nedikir. Navbera min û edebiyatê nebaş bû. Piş re mamosiyek nû hat û hemû jiyana min guherand... Navê wî İlhan Başgöz bû. Mamosiyê edebiyata gelêrî bû.

Di destpêkê de Orhan Veli bi min da hezkirin û piş re jî Orhan Kemal, Said Faik...

We kengê dest bi nivîsînê kir?

● Pişti ku min ew nas kir, di nav sê mehan de di lîseyê de ez bûm serokê şaxa edebiyatê û me rojnameyeke dîwaran derxist. Min şîr dinivîsand.

Şîra min a yekemîn, mamoste İlhan ji bo kovara Kaynakê bi rî kir û di wê kovarê de derket.

Pişti ku li Stenbolê min dest bi fakulteya hiqûqê kir, min û komek hevalên min, me bi navê "A" kovarekê derxist. Sebebê weşana kovara me ew bû ku kovarên din şîrên me nedîweşandin.

Yanê karê we yê weşan û nivîskariye bi hev re dest pê kir?

● Belê her duyan bi hev re dest pê kir, lê ji mecbûriyê... Piş re min dev ji şîrê berda, dest bi nivîsîna çirokan kir. Min fêm kir ku şîrên min xerab in û min ev defter bi temamî girt. Gelek şîrên min di kovarên herî baş de hatibû.

ne weşandin jî, lê şîr xerab bûn, ez ne şair bûm. İro gelek kesen ku şîrên wan xerab in, lê dîsa jî şâiriyê didomînin hene...

Qanûnen vî welatî tesîra xwe li nivîskariya we kiriye, ku kiribin, bi ci awayî û çawa?

● Na bi tu awayî qanûnan tesîra xwe li nivîskariya min nekiriye, bêhîr weşanxaneya min zêde wextê min stand û tesîr li nivîskariya min kir. Yanê ji nivîsandinê re zêde wext nehişt... Lî ez dîsa jî ne xemgîn im, pê kîfxwes im; ji ber ku min bi vê munasebetê nivîskarê din derxistin pêş, rî li pêşiya wan vekir.

Yanê di nivîsandinê de, qanûn nabin astengî?..

● Belê, lê dema ez dinivîsim, hay ji xwe heme, ku nebim súcdar. Gelek súcdariyê bi ehmeqî ji hene. Ez xwe jê diparêzim. Mesela, dema min kitêba xwe ya bi navê "Gülünün Solduğu Aksam" nivîsand, di wê demê de hevokê wisa hebû ku súcekî giran bû. Deniz Gezmiş dema ku ew bi dar de kiribûn,

Ez ji Kirşehirê me, di sala 1935'an de li Yıldızeliyê hatime dinyayê. Pişti demeke kurt em çûne Kirşehir. Di nasnameya min de Kirşehir dinivîsand, lê vê gavê Yozgat dinivîsine. Di fakulteya hiqûqê de cara yekemîn polisan ez girtim, ez birim Xana Sansaryanê, min lêdan xwar û dema ez berdam, nasnameya min nedane min. Partiya DP'ê, Kirşehir kiribû navçe û navçeya wê Nevşehir ji kiribû navend. Di wê tevliheviyê de qeydên nifûsê jî tevlihev bûn. Ji ber wê, niha di nasnameya min de Yozgat dinivîsine, lê min tu carî Yozgat nedîtiye û ez naxwazim bibînim jî... (Li Yozgatê nîjâperest pir in. A.W.) Bavê min hakim bû, ji ber ku cihê wezifeya wî tim diguheriya, heta min dibistana seretayî qedand, ez ne şaş bim, min yazdeh dibistan guherandin. Min dixwest ku ez hunerên bedew (güzel sanatlar) bixwînim, lê ji ber ku pereyên bavê min têrê nedikirin, min dest bi fakulteya hiqûqê kir. Di wê demê de tenê li Enqere û Stenbolê fakulteyen hiqûqê hebûn.

gotibû.

Min ji wê hevokê pênc peyv derxistin û nuqtê danîn cihê wan û jêrenot danî: Ji vê hevokê pênc peyv hatine derxistin... Pişti mehekê min di çapa duymîn an ji sêyemîn de ji wan pênc peyv van yekî xistinê û jê re not: Ji vê hevokê çar peyv hatine derxistin... Di çapa dû wê re min du peyvên din xistinê û jê re not: Du peyv hatine derxistin... Piş re yekî din û di dawiyê de ya din; peyv bi temamî ketinê. Polisan tê derxistin, ji ber ku tenê çapa yekemîn xwendibûn.

Ew hevok ci bû?

● Bijî biratiya gelê tirk û kurd!

Tîştekî wiha hêsan... İro kî ji me vê nabêje?

Lê wê rojê ev gotin, súcekî giran bû! Dema te bigota, tu dihatî girtin û kitêba te jî dihat berhevkirin. Di wê demê de Nihat Behram ji li ser Deniz Gezmiş û hevalên wî kitêbek nivîsandibû û ew kitêb ji ber wê hevokê hate berhevkirin.

Nivîskar dikare bij her awayî gotina xwe bibêje. Ew çax ji, li we hêrs dibin, mina ku li min kirin; we li ser tîştekî

din mehkeme dikin!

Çima û we li ser çi mehkeme kırın?

● Ez li ser revandina teyarê girtim. Yanê li gorî wan ez korsanê teyarê bûm! Di sala 1971'ê de ku teyareya bi navê Boğaziçi revandin, ez û Altan Öymen û Emil Galip Sandal hatin girtin. Li gorî wan, me ji 45 mirovan râxiştinek ava kiribû û em serokê râxiştinek bûn, teyare jî bi emrê me hatibû revandin. Polis jî dizanibû ku tu têkiliyên me bi teyarê re, bi revandina wê re tune, lê derd û kula wan cuda bû...

Hêrsa wan ji nivîskarî û helwesta me ya demokrasiyê dihat; em girtin û işkenceya xwe jî kırin...

Di kar û barê weşanê de?..

● Belê, di karê weşanê de astengî derxistin. Lê min ji bo wê jî riyek dit: Çar kitêbên me li pey hev, li ser mustehceniyê berhev kırin: Du kitêbên Pinar Kür, yeke Ahmet Altan û yeke Henri Miller mehkûm kırin. Heyeta şêwirmendiyê di rapora xwe de bi rengekî vekirî: "Di vê... di vê... di vê hevokê de hêmanên sûc hene;" gotibû. Mehkemeyê nîvî wan qebûl kir, nîvî din qebûl nekir. Her du kitêbên Pinar Kür be-raet kırin, lê ya Altan û Miller mehkûm bûn. Me jî cihê wan hevokên súcdar bi bandêr reş girt û me kitêb weşand. Lê me biryara mehkemeyê jî xiste destpêka kitêban. Yanê yê ku meraq bikira, li destpêka kitêban dimeyzand. Û ev ne sûc jî bû.

Nêzîkî nîvî Kırşehirê kurd in, têkiliyên we û kurdên wir çawa bûn?

● Ez bi tenê bi mêvanî diçûme. Kırşehirê, li ser vê jî nikarim zêde tiştekî



Piştî ku "Xelata Azadiya Ramanan" stand, Yaşar Kemal wî pîroz dike.

mandine. Kurdan jî di dawiyê de bi mafdarî reaksiyon dane nîşan. Xerabiyên mezin qewimîn. Ez li ser navê tirkan şermezar im, şerm dikim. Yanê ez dema kurdeki dibînim, ji ber ku ez ne kurd im çawa ku di wê xerabiya ku hatîye serê wan de para min jî hebe, ez dişim. Wan jî di dawiyê de reaksiyonâ xwe ya însanî dane nîşan. Yanê ne bû-yereke nû ye, lê pir mezin bû...

Ez pir çûme Başûrê Rojhîlat. Rojekê xwendekarê zanîngehê li dora min ci-viyan. Yekî ji min re ev gotin:

Ev heftê sal in ku siyaseteke çewt hatîye danîn û rîveberên dewletê her ku çûye, bêhtir bi şîdet ev çewtî domandine. Kurdan jî di dawiyê de bi mafdarî reaksiyon dane nîşan. Xerabiyên mezin qewimîn. Ez li ser navê tirkan şermezar im.

"Yaho kekê Erdal we riye devê me û berdaye! We zimanê me yê zikmâkî qedexe kir; me nekarî em zimanê xwe bi pêş ve bibin. Li dibistanan jî we em baş hînî tirkî nekirin. Ez dixwazim bibim nivîskar, lê ez kitêbên Yaşar Kemal dema dixwînim, nikarim wekî te tamê jê bistînim. Lewre tirkiya min jî xerab e. Yanê we ramana min jî qedexe kiriye. Ku ziman seqet bibe, fikir jî sejet dibe. Ev ne şerm e ku hûn dikin?"

Ê ew pir mafdar bû; min dikaribû çi bersiv bidayê. Di zanîngehê de dixwend, lê ne baş bi tirkî dizanibû, ne jî bi kurdi. Wê ev tefal çawa bixwîne? Çawa bifikire? Û wisa jî bi niyetekê baş bû... Digot hûn súcdar in; tabî em súcdar in... Mirov ziman qedexe dike?!

bibejim. Rast e, li wir kurd zêde ne û piraniya wan jî alewî ne. Mixabin ku ez ne alewî me. Lewre vî welati ji destê sunîtiyê geleki kişandiye. Alewî bêhtir demokrat in.

Di zarokatî û xortaniya min de, cûdabûna tirkan û kurdan tunebû. Bûye-ra kurdîtiyê pişte hate vê radeyê. Pirsgirêka kurdan her tim li Tirkîyê hebû, lê di wextê me de aramî hebû, bê-dengî hebû.

Ji bo çi di van salê dawîn de ev pirsgirêk hate vê radeyê?

● Ev heftê sal in ku siyaseteke çewt hatîye danîn û rîveberên dewletê her ku çûye, bêhtir bi şîdet ev çewtî do-

kerên Lenîn û Marks û Stalîn û nizanîm kî, nikaribûyi bimeşîya. Mîna panoyen reklamê li her derê, bi her diwarî ve hevokên Marks, Lenîn, Stalîn.. Yanê tu nikarî Lenîn nas bikî, lewre bûye peyker... Wekî Atatürkê me. Tu dizanî ku fabrikayê Atatürk çêkirin, ji bo ku peykeren wî çêbikin. Yanê tu êdî nikarî Atatürk nas bikî.

Yanê ew Atatürkê ku vêga heye, ne Atatürk bi xwe ye. Atatürk; qusûrên wî jî hebûn, lê şexsiyeteke mezin e. Ez pir jê hez dikim. Wî rexne dikim, kîmasiyên wî, qusûrên wî rexne jî dikim, lê jê hez jî dikim. Ew Denizê ku min di kitêba xwe de nivîsandibûn, ji mirinê ditirse, hesten wî hene, di serê wî de evîdarî derbas bûye, edebiyatê dixwîne, ji vexwarina bîrayê hez dike. Yanê min ne peyker nivîsandiye; min însan nivîsandiye. İnsaneñ bi rastî jî cesûr...

We got, min ji ber qanûnan riya re-vê ditiye. Lê hûn û Yaşar Kemal mehke-me bûn û we ceza xwar; diyar e ku ew rî ne zêde bi ewle ye...

● Belê wisa ye, lê ez ji wan û ji gitina wan, ji cezayê wan natirsim. Ji bo ku ev qanûn rabin ez van kitêban çap dikim. Ku kes li hemberî van qanûnen çewt tiştekî neke, wê ev her bîmîn. Di hemû qanûnen vî welati de çewtî hene, divê mirov li hemberî wan tekoşînê bide.

Li gorî we heta vê gavê li diji van qanûnan têkögîneke baş hatîye dayîn?

● Nexêr! Ji ber ku li vî welati azadiya raman gelek kesañ eleqeder nake. Yanê ne wekî hemwelatiyên neteweylekî ne, mîna endamîn cemaetekî ne. Vê ji xwe re nakin pirsgirêk. Lê rastî ev e



gotibûn, teanê ew mabû ku negotibûn tu polis i... Piştî demekî ji eyî girtîgîhê û ew mirovîn ku ez rexne kiribûn name hat; ji min kitêb dixwestin. Min ew kitêb ji wan re bi rî kîn, ji ber ku ez gitîngîya kitêban di girtîgîhê de dizanîm.

Ew kî bûn û ji bo çi hûn protesto di-kirin?

● Şoreşger bûn. Wisa zêde şoreşger bûn ku ji ber şoreşgeriyê mecalâ xwendinê û demokratbûnê nedîtibûn. Sebeb jî ev bû, ku min Deniz Gezmiş mîna însaneñ wekî me dabû nîşan. Min ew "mîtos" a di serê wan de hilwesandibû. Lewre ez ji lehengîn ku dikin mîna "mîtos" û mîna peyker nefret dikim.

Wekî Sovyeta berê dikin. Tu ji pey-

Min fêm kir ku şîrîn min xerab in û min ew defter bi temamî girt. Gelek şîrîn min di kovarîn herî baş de hatibûn weşandin jî, lê şîr xerab bûn, ez ne şâr bûm. İro gelek kesen ku şîrîn wan xerab in, lê dîsa jî şârîtye didomînin hene...

ku azadiya raman temel û xîmê hemû mafan e...

Pirsgirêk nivîskaran ên esasî ci ne?

● Li gorî min, ji bo nivîskar pirsgirêk esasî kaxiz û pêñûs in. Hadê, bîbêje bila komputer be... Ji xeynî van, divê ji bo nivîskarekî astengî tune bin, lê di civakeke wekî ya me de, hin mîsonen din dikevin ser milen nivîskar. Li Ewrûpayê ji bo nivîskaran ev pirsgirêk tune. Li ser bêhnê, li ser evînê, li ser zanista nîgaşî (bilim-kurgu) difiki-rin, xeyal dikin û dînîvisin, berhemîn xwe diafirînîn.

Bîranîna Melayê Cizîrî û pêşniyazek

Ji layê Enstituya Kurdî ve, di vê hefteya rabûrî (roja 8'ê sermawez 1996'an) der barê Melayê Cizîrî û helbestvaniya wî de panelek hat lidarxistin. Axivgerên vê panelê Feqe Huseyin Sağnîç, Abdullah Varlı, Kerem Soylu û Felat Dilges bûn.

Ji ber ku cara yekê paneleke wisa berfireh (bi taybetî li ser Melayê Cizîrî) li dar dikeve, digel lawaziya xwe ya ji layê naverokê ve jî, em dikarin bibêjin paneleke serkeftî bû. Çimkî axivgerên panelê tevde, bêyî şirovekirineke berfireh a li ser hunermendiya Cizîrî di warê helbestî de, bi giranî li ser mêtûya ji dayikbûn û jînenigariya wî peyivîn.

Ev jî, ji bo nasîn û danasîna hunermendiya yekî wekî Melayê Cizîrî ku şahsiwarê helbestvaniya kurdî hatiye herêkirin û di gêra helbestvaniya Rojhîlata Navîn de cihekî xwe yê payebilind heye, bêguman panelên wisa ku ji salê carekê, tenê ji bo bîranîna wî têne kirin, wê ne bes bin.

Şahsiwarê helbestvaniya kurdî Melayê Cizîrî yê ku bûye rûmeta netewiyî ya gelê kurd, pir mixabin ku heta niha ji layê nûhatiyê kurdan ve bi duristî nehatiye nasîn û ji layê saziyê kurdan ve, di encama xebateke cidî de nehatiye danasîn.

Hunermendekî serbixwe

Di despêka salên 1960'î de dema ku Cegerxwîn li Bexdayê bû, digel hinek torevan û ronakbirê kurd, li ser helbestvaniya Melayê Cizîrî lêkolîneke berteng dikan.

Di encama vê lêkolîna berteng de ji layê wan ve tê dîtin ku der barê ristina helbestê de, di navbera Cizîrî û helbestvaneneverê de cudayıyeke mezin heye. Wekî tê zanîn ku tevaya helbestvanen helbesta klasikî, helbesten xwe li ser jimara movikan dirîsin. Belê Cizîrî, ji tevaya helbestvanen klasikî cuda, digel jimara movikan jî, li ser deng û bizava dangan, (li ser rezana dengen nizm û yên bilind), ji helbestvaniyê jî wêvetir, bi şeweyekî hunermendî helbesten xwe ristine. Jî bilî hinek helbestvanen kurd (Ehmedê Xanî, Pertew Beğê Hekâri, Siyapoş, Cegerxwîn ..) di helbestvaniya Rojhîlata Navîn de (temet ku ez dizanim) bi vî şeweyê Cizîrî helbest nehatiye ristin.

Di nav helbestvanen kurd de jî, tenê Ehmedê Xanî kariye vê şopê bi serbilîndi bidomîne. Her çende Cegerxwîn jî xwestiye bide ser vê şopê û hinek helbesten xwe bi vî şeweyî ristine jî, lê nekariye heta dawiyê vê şopê bibe serî.

Hêjayî gotinê ye ku nivîskar lêkolînerê hêja Deham Evdîlfetah (Bêyî ku agah ji wê lêkolîna berteng ya Cegerxwîn û hevalen wî hebe), di encama lêkolîneke dûr û dirêj der barê vê babetê de, jêhatin û hunermendiya Melayê Ci-

Ji bo danasîna Cizîrî û helbesten wî ji hemû layen hunerî ve dil dixwaze ku Enstituya Kurdî digel tevaya saziyê kurdî di encama kombîneke berfireh de bigihên biryarekê û ji nav xwe komîteyeke berfireh ji pisporê torevaniyê pêk bînin.

zîrî bi gelek nimûneyan û bi berfirehî li pêş çavan xwes radixe.

Mamoste Deham, di verêja (esera) xwe ya berkeftî, "Nerîneke Rexneyî li ser Helbesten kurdî" di rûpela 46'an de wisa dibêje: "Dîwana Melayê Cizîrî se-ranser xwe dide ber rêxistina kît û pêlikîn pêlawazan. Malikek tenê jî şikestî, yan jî leng têde nayê."

Pêşniyazek

**Bila sala du
hezaran bibe
sala Melayê
Cizîrî!**

**Ji bo
nasîna
Cizîrî .
û tê-
g i -**



hîştina
huner-
mendîya
wî ya hel-
bestî, di hef-
tiya rabûrî de,
panela ku ji layê
Enstituya kurdî ve ji
bo bîranîna Melayê Cizîrî hat lidarxistin, dil dixwaze

ku ev xebat neyê sar kirin û ev xebat bi-
be destpêka nivîsina rûpeleke rûmetê di
mêtûya xebata sext û pir asteng a En-
stituya kurdi de.

Ji bo danasîna Cizîrî û helbesten wî
ji hemû layen hunerî ve (li gorî daxuya-
kirina Deham Evdîlfetah, kîlişeya ten û

bedena helbestê, naverok û kakila hel-
bestê, kês û pêlawaza helbestê, rîben-
da helbestê, peyv û pirsên helbestê), dil
dixwaze ku Enstituya kurdî digel teva-
ya saziyê kurdî di encama kombîneke
berfireh de bigihên biryarekê û ji nav
xwe komîteyeke berfireh ji pisporê to-
revaniyê pêk bînin. Pisporê ku di vê
komîteyeke berfireh ji pisporê to-
revaniyê de wê cih bigirin,

divêt serdestî her çar zi-

manen deverê bin û

di gêra torevani-

ya her çar ne-

teweyan de

zîrek û

melevan

bin.

**B i
a 1 -
karî
û**

palpiş-

tiya sa-

ziyê kür-

dî, ji layê

vê komîteye-

ve di van her sê

enîz de, ji bo da-

nasna "îzîrî û hel-

beste" ya her cihe-

kî ku destê wan vê re digihê û bi
her zimanekî ku karîbin, helbesten Ci-
zîrî lê bêne wergerandin û der barê vê
babetê de peyapey şahî û panel bêne li-
darxistin.

Piştî lêkolîneke hûr û kûr li ser hel-
besten Cizîrî, her ji layê vê komîteyeke
ve, tevaya helbesten Cizîrî ji nû ve (bi

tîpê latînî) pêdiviyen çapkîrinê ne.

Agahiye

Di wergera tiprîziya dîwana Melayê Cizîrî de ku ji layê Zeynelabidîn Zinar û M. Emîn Narozi ve hatiye amadekirin, hinek kîmasiyen çapê hene ku dibine egeren têkbirina kês û rîzbenda helbes-
tê û berovejîkirina naveroka helbestê.

Bo nimûne di şeşemîn malika "Ka ehd û peyman" de:
Bêj ew şirîna surperi, durdane ya ez muşterî

Ka ehd û peymana berê? Bê fayde çûn subhê heba
Rêza yekemîn ya ji helbesta "Qedrê gu-
lê ci zane, kerbes divê kerê res" de; *İro "Mela" serapa lew têki bûme ates*

Rîzbenda şeşemîn malika "Ka ehd û peyman" <erî> ye. Rêza yekê 'surperi' rîza duwemîn 'muşterî' durist hatine. Lê rîza sîyemîn 'berê' ne durist hatiye. Di nav gelê kurd de li ser Melayê Ci-
zîrî tê gotin ku; Berekî (kevirekî) mezin hebûye, Melayê Cizîrî her tim diçû piş-
ta xwe dida wî berî û helbesten xwe di-
ristin. Gava ku helbesten xwe diristin, an jî bi deng digitin, ji tîna dilê wî, ew
ber disinciri.

Her wisa tê gotin ku; Şahsiwarê hel-
bestvaniya kurdî Melayê Cizîrî, di kês
û rîzbenda helbesta xwe de tu carî şas-
nabe. Mamoste Deham jî "Malikek te-
nê jî yan leng, yan jî şikestî nayê" dibê-
je. Mamoste Enwer Mayî jî: "Helbest-
van pêkve dîl û bindesten rîzbendan in;
Melayê Cizîrî tenê, rîzbend dîl û bin-
desten wî ne" dibêje.

Li pêş ronahiya vê gotina gelêri û li
pêş ronahiya daxuyakirina van her du
helbestvan û lêkolîneren hêja, bo me
xwes diyar dibe ku ev rîzbenda "ka ehd
û peymana berê" leng hatiye û li cihê
xwe ne xwes rûniştiye. Melayê Cizîrî ji
hunermendekî wisa pêjinkere ku şasi-
yên wisa berçav tu carî li ser xwe herê
nake.

Ji ber ku jîvangeha Cizîrî, (ci digel
helbesten tê ci digel Selwayê) her li ber
wî "berî" bûye û fier di beşê tipê erebi
de yê vê dîwana ku her du wergeran
âmade kiriye "berî derbas dibe û bêgu-
man wê ev rîzbend jî wisa bê:
Bêj ew şirîna surperi/ Durdane ya ez muşterî

Ka ehd û peymana berî/ Befayde çûn subhê heba

Her wisa rîza yekemîn ji helbesta
"Qedrê gulê ci zane, kerbes divê kerê
res" jî, peyva "Serapa" bê cih e. Diviya
"İro Mela, ser û pa lew têki bûme ates"
hatibûya nivîsin.

Kîmasiyen çapê yê bi vî rengî hi-
nek hene. Bi kurtayî, ev kîmasiyen bi
vî rengî û yên wekî din jî ku di helbes-
ten Cizîrî de cih girtine, bendewarîn
komîteyeke ne ku ji pisporan pêk hatiye.

DILDAR ŞEKO



Li navendê çandê vê hefteyê: LI NÇM'ya Stenbolê

- 17.11.1996 **Yekşem:** Konser: AKSM, Grup Yorum, saet: 13.00 Teatra Jiyana nû: Daweya Generalê Teneke, saet: 17.00
- 20.11.1996 **Çarşem:** Semîner: "Welatparêziya Exmedê Xani", Nivîskar Medenî Ayhan, saet: 18.30
- 22.11.1996 **În:** Filmê Frederico Fellini: "Kuçeyên bêdawî", saet: 18.30

Li Evrensel Kültür Merkezi:

- 17.11.1996 **Yekşem:** Semîner: Tesîra Şoreşa Octobrê ya ku li ser teatrê bûye, saet: 15.00
- 18.11.1996 **Duşem:** Filmê Krystof Kieslowsky: "Li ser kuştinê

kurtefilmek", saet: 15.00. Resîla Gîlara Flamenko, A. Fuat Yılmazoğlu

- 19.11.1996 **Sêşem:** Filmê Kieslowsky: "Li ser kuştinê kurtefilmê", saet: 15.00. Û 19.00
- 20.11.1996 **Çarşem:** Film: "Evîndara min Funcî"
- 21.11.1996 **Pâncsem:** Film: "Gandi", Richard Attenbourgh, saet: 15.00 Û 18.00
- 22.11.1996 **În:** Film: "Her dem", S. Spielberg, saet: 15.00 Konser: Kelayen ji qumê, saet: 19.00
- 23.11.1996 **Şemî:** Teatra Zarokan, saet: 11.00, Film: "Masiyê Siyamê". Sohbet: Li ser "Masiyê Siyamê", saet: 17.00

RÛDAN

Qedera Welatê Me

Di nav gelek zor û zehmetî
û astengiyan de, me
46 hejmar ên Welatê Me
derxist, lê mixabin di dawiyê
de qedera Welatê Me jî
bû mîna ya Welat.

AYNUR BOZKURT

Pêşî Kurdistan û dû re çendê din... Pişî demeke dirêj Hawar û Ronahî û dû re çendê din... Demeke jê jî dirêjtir Welat û Welatê Me û... İro jî Azadiya Welat û çendê din... Van tev jî hema bêje bi eynî armancê weşan kirin, her çiqas şert û merçen ku di nav de bûn ne wekî hev bin jî.

Ji roja ku Rojnameya Kurdistan derketiye (1898) heta iro (1996), 2 sal maye ku bibe "100" sal. Belê tam 100 sal.

Gelo di nav 100 salan de merhaleya ku rojnamegeriya kurdî gîhiştiye, li gorî dilê me ye? An jî ku em bi rojnamegeriya gelên din re qiyas bikin, emê ci en-camê jê derxin?

Ez bawer im vêga wê ev tişt werin bîra we jî: "Gelê kurd bêdewlet e, ji hev hatiye dûrxistin, erdê wan bûye çar parçê, her çar dewletê (heta jî zêdetir) ku li ser erdê kurdan xwedî gotin in, geleq tehdî û zilm û zordariyê û geleq tiş-tên din li kurdan dîkin û ji ber wê jî..."

Belê ev tev rast in, lê divê mirov vê jî, ji xwe bipirse: Gelo di nav 100 salan de tişten ku divê werin kirin, tev hatin kirin?

Esas mijara me ne nirxandina giştî ya bi vî rengî bû, mijara me salvegera der-xistina Rojnameya Welatê Me bû.

Welatê Me di 20'ê sermawez 1994'an de derketibû, da ku valahiya di vî warf de -pişî ku Rojnameya Welat weşana xwe sekinand- dagire.

Em çend kes hatin ba hev, ji derive me çend xebatkar anîn û bi dilekî coş me ca-reke din dest bi xebatê kir. Pêşî me tişte-ki muhîm danî ber xwe; Bila qedera Welatê Me jî, ne wekî ya Welat be...

Eleqeya kurdan

Di hejmara yekemîn a Welatê Me de birêz Amed Tigrîs di nîvîsa xwe de diyar kiribû ku, di wê dema ku Rojnameya Welat weşana xwe sekinandibû de, ji Qamişloyê heta Helebê, Efrînê, Serêkaniyê û Şamê, ji Stokholmê heta Hambûrgê, Amsterdamê, Helsînkiyê, Awustûrallyayê, Kanadayê û ji gelek cihê din... pirsa Rojnameya Welat jê hatiye kirin û gelekan gazinê xwe anîne ziman: Çima Welat êdî dernakeve?

Dema mirov van rîzan dixwîne, pê



şad dibe ku kurd li ku derê dibin bila bibin, eleqeyeke baş nîşanî weşanên kurdî didin û lê xwedî derdi Kevin. Belê eleqe nîşanî weşanên kurdî didin, lê belê disa jî wisa dixuye ku ev eleqe têrî guherîna qedera weşanen nake.

Di nav gelek zor û zehmetî û astengiyan de, me 46 hejmar ên Welatê Me derxistin, lê mixabin di dawiyê de qedera Welatê Me jî bû mîna ya Welat.

Ha, divê ev jî were zanîn ku, bi saya Welat û Welatê Me gelek kes hînî xwendin û nîvîsandina kurdî bûn û ew "ker û lalî" ya kurdan hinekî be jî hate kêmkirin. Jixwe yek ji armancê me jî ev bû...

Mehkeme û zîmanê kurdî

Di wê demê de ji 3 hejmarên Welatê Me re, ji aliye Dadgeha Ewlekarîya Dewletê ya Stenbolê (DGM) ve doz hante vekirin. Vêga her sê doz jî li Mehke-meya Bilind (yargitay) in.

Dema ku em hatin mehkemekirin, di mehkemeyê de, li hemberî qedexebûna zîmanê kurdî ya di cihê resmî de, me li ber xwe da û em bi kurdî peyivîn. Lî belê kesen ku dihatin ji bo temaşeya mehkemeyê, ji dehan nediborîn. Ev jî eleqe-ya kurdan a li hemberî zîmanê xwe bû!..

Armanca min ne ew e ku ez kurdan ji binî ve sûcîdar bikim, bi bêeleqebûnî. Ez baş dizanim ku gelek xwendevanên me dema rojname derdi keve, peyy têrî wan nake ku pê kîfxweşîya xwe bînîn zîman, dema rojname disekejî bi kelegîrî xemgîniya xwe û gaziñen xwe jî diyar dîkin, mîna kesen ku birêz Tigrîs di nîvîsa xwe de behs dîkir.

Pêşî Kurdistan û dû re çendê din... Pişî demeke dirêj Hawar û Ronahî û dû re çendê din... Demeke jê jî dirêjtir Welat û Welatê Me û... İro jî Azadiya Welat û çendê din...

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Sey Riza

Dîroka şaran de rolê serokan, rolê kesan geganê bêguman zaf bi qedr o. La belê ganî ma, yanê kirmancê hemdemî nê rolî rind fam bikerîme. Ma ganî serokanê xo, ne bêhemd biqedrnîme, ne jî qij bîvînîme. Ma de jû nîweşîye esta. Her çî, hama her çî, ya siyao wo, yan jî sipê wo. Yanê ya rind o, yan jî xirab o.

La belê ewro ma rind zaneme, ke çî şîkînê hem siya û hem jî sipê bê. Çî şîkînê hem rind hem jî xirab bê. Ma se şîkînîme vacîme: "Keso ke alaya/bayraqa osmaniya rîya verêne Xozat de darde kerda, welatparez o?" Ma, ma se şîkînîme vacîme: "Keso ke alaya osmanîyan Xozat de darde kerda û bado jî hetê osmanîyan/tirkan ra amo dardekerdene, welatparez niyo?"

Der heqê Sey Rizay de mordem şîkîno zaf çiyan binivisno. Sebeta ke Sey Riza û şexsiyêtê Sey Rizay de dîroka Dêrsimî rind û raşt niyama famkerdene, na het de xêlê şâşî estê. Bêguman na tema, temayêde derg û dorhîra wa. Seba naye jî ez mesela kîlm cêna û teyna Sey Rizay ser ro vindena.

Naye rî jî ma ganî dîroke ebi dîmenzonanê newîyan bîvînîme û binivisnîme. Sey Riza kam o?

Sey Riza Dêrsim de jû pîrêde ebi nam û vengi yo.

Sey Riza pîrê kirmancî yo.

Sey Riza serokêde aşîret o.

Sey Riza heval û rayberê Alîşêr û Baytar Nurî yo.

Sey Riza hemverê dewleta tîrkî yo, hemverê "kemalîstanê ke wazanê halîfî raxalesnê, pey de biyarê" wo.

Sey Riza hemverê kolederan o.

Sey Riza dostê bindestan o, hevalê bindestan o.

Sey Riza seba kirmancî wo.

Sey Riza naîf o.

Sey Riza dek û dubaran nêzano.

Ma Sey Riza çik niyo.

Sey Riza hunermendêde şer û leşkeriyê niyo.

Sey Riza serokêde hemdem niyo.

Sey Riza politîkvanêde hemdem niyo.

Sey Riza zonê tîrkan ra, zonê kolederan ra fam nêkeno.

Sey Riza naîf o.

Hama, Sey Riza merd o.

Sey Riza bêtters o.

Sey Riza kela cesaret û merdî yo.

Se?

İhsan Sabri Çağlayangil vano: "Ti Enqera ra ama, ke mi darde kerê?" Ma jûbinî de niya da. Ez rîya verene ebi kesoke êno dardekerdene, êna rû bi rû. Mi rî hûya. Sawcî pers kerde, ke nimaj keno yan jî nêkeno. Nêwayş...

Tûkê min bî têlî. No moderno kal rep-rep raye ra şî. Aşiq ton da. Lak eyşt re vîle xo. Ebi linga xo pînê dê kursî ro, infazê xo virayş... Hama, mi xo cesaretê nê kalî teqdîrkerdene ra nêguret ra."

Ez verê Sey Rizay, pîrê kirmancîye, dostê bindestan de roja dardekerdene dê de

'Nîrê çapkirina weşanê kurdî'

li Sûriyeyê zor dijwar in

Me dixwest, hinekî bi firehî li ser rewşa rojnamegeriya kurdî li vê hêlê (Başûrê Biçûk) rawestin û perdeyê ji ser perîşanî û qelsiya rojnamegeriya xwe bidin alî, da em zanibin ku hejmareke mezin ji kovaran, ne tim nîşana xurtî û pêşxistinê ye. Erê, ev qas kovar têne weşandin wekî Zanîn, Aso, Gulistan, Stêr, Buhar, Gelawêj, Pirs, Roj, Xunav... û bi zimanê erebî El Hiwar (Hevpeyvîn) û Ecras (Zengil) û hwd. Lê çi berhem, bi çi awayî, bi çi rengî û her ji çend salan hetanî hejmarek derdikeve, yanê eger yek di şeva zewaca xwe de helbestekê bide kovareke kurdî, wê lawê wî berî helbesta wî roniyê bibîne, ev rastiyek e..

Ji bilî kovarê ku çend hejmarokên pîsik hatin weşandin û pişt re bêdeng mirin; kovar bi tevayî di rewşeke nelîserhev de têne weşandin. Piraniya kovaran rêxistinê kurdî derdixin, lê dema rêxistin parce dibe, kovar jî dibe du kovar û sê kovar û...

Di vê rewşa kambax de ku hayê tu kesî ji "gotina nivîsandi" tune ye(!) berpirsê van çar kovaran (Zanîn, Pirs, Stêr û Garzek Gul), bersiva pirsê me dan.

Hêjayî gotinê ku em bi ser neketin di gel hemû hewldanê xwe em bersiva pirseke tenê jî berpirsê Gulistan û Buharê bistînî. Her wiha me berpirsê El Hiwarê jî negirt ku em pirsê xwe ji wî jî bikin...

Emê bi dorê bersivêvan kovaran pêşkêşî xwendevanê xwe bikin. Di vê hejmarê de em dê bersivêvan kovara Pirsê biweşinîn.

Despêka rojnamegeriya kurdî, li Başûrê Biçûk, bi çi awayî bû û kengê dest pê kir?

– Bi kurtiyeke zor mezin, em dikarin diroka rojnamegeriya kurdî, li vî parceyê welêt, li ser çar qonaxan bi par ve bikin:

Qonaxa rojnameya Kurdistanê (1898): Rast e, ev rojname ne li Kurdistanê hate derxistin, lê ew wekî yekemîn rojnameya kurd, dibe zemîna rojnamegeriya kurdî li hemû parceyên Kurdistanê. Ev ji hêlekê ve, ji hêleke din ve parake mezin ji hejmarê "Kurdistan"ê li vî parceyî û li Şamê dihatin belavkirin, vê yekê mezintirîn kêt û bandor li rewşenbir û ramyarê Kurdistanâ Suriyeyê dikir.

Qonaxa duduwan: Qonaxa Kovara "Hawar"ê ye, Hawarê dikarîbû mezintirîn rol di her warê jiyana civakî de bileyize û dikarîbû bibe navenda bingehdâna zimanê nivîsinê, ya ku bi rojnameya Kurdistanê dest pê kiribû. Vê kovarê dergehîn mezin ji derbirînê re vekirin. Û dibû çavkaniyeke buhadar di rîzima-

îrê çapkirina weşanê kurdî, li Sûriyeyê zor dijwar in. Ta roja iro bi nehêni karê çapemeniyê tê kirin. Carinan du heyvan (mehan) kovar dereng dikeve, ji ber çapkirinê. Ev hinek ji astengan, hêla din bi ziman û nivîser û berpirsê rojnameyan ve girêdayî ye.

şêweyeke nû xwe berdewam kirine.

Kovarê iro, tev demsala ne, lê tev ji nikarin di demêni xwe de derkevin; ji ber ku nîrê berê, hîn bi rengekî berdewam in.

Kovara Pirs, kengê dest bi weşanê kir, çend hejmar hatine weşandin?

– Kovara "Pirs"ê di newroza sala 1993'yan de dest bi weşanê kiriye. Komîteyên berpirs ên kovarê Gelawêj; Stêr û Rê biryar dan, bi yekîtiya her sê kovaran, ta ku karibin kovareke birêkû-pêktir derxînîn û her sê kovaran bidine rawestandin. Ji vê yekîtiya sê kovaran, kovara Pirs hatîye weşandin. Ta niha 9 hejmar hatine belavkirin.

Rewşa rojnamegeriya kurdî, iro çawa dibinîn?


– Iro, bi doh re nayê berhevkirin, lê "hevakamî" dimîne asayake durist di her warî de. Civakeke lipaşmayî, bi rîje-yî wê nikaribe di çalakiyên xwe de afîrandinê bêhempa bi dest bixîne. Ji ber ku ta roja iro kar tê kirin bo paşvexistina civaka kurd. Di rewşeke wiha de, wê rojnamegeriya kurdî jî li paş bimîne. Nebûna azadiyên derbirînê bi gişki û derbirîna bi zimanê kurdî bi taybetî, ew jî dibe sedemeke din ji sedemîn lipaşmayîn û astengbûnê re.

Nîrê çapkirina weşanê kurdî, li Sûriyeyê zor dijwar in. Ta roja iro bi nehêni karê çapemeniyê tê kirin. Carinan du heyvan (mehan) kovar dereng dikeve, ji ber çapkirinê. Ev hinek ji astangan, hêla din bi ziman û nivîser û berpirsê rojnameyan ve girêdayî ye. Zimanê nivîsinê, nikare di riya rojnamevînyê tenê re bibe zimanê cemawerî. Dam û dezgehîn din gerek in. Dûrbûnek, di navbera xwêner (xwendevan û nivîser (nivîskar) de heye. Nivîsinê bi zimanê kurdî asta wan a zanistî û akadîmîk ne gelekî bilind e, ev yek dihêle ku rojnamegeriya kurdî berteng bibe.

Bi rastî, pêşvebirina rojnamegeriya kurdî, li vir, bi gelek hoyan ve girêdayî ye, hin ji wan hoyan, iro pêkanîna wan zor e. Yek ji teqela û hewldanan, bidestxistina dezgehîn çapê û çarekirina dijwartirîn astengê ye. Em bi hêvî ne ku, em dê karibin "Pirs"ê di demêni wê de, belav bikin. Çend teqela hatin kîn bo çareserkirina hin astangan, lê bi ser neketin.

Bûyîna navendeke ku hembêzgêr be ji nivîser û çalakiyan re, wê karibe gelejji astengên nivîsin û rojnamegeriya kurdî çareser bike û ew navend di yekîtiya nivîser û rojnamenivîsan de tê dîtin lê ta roja iro hemû karênu ku der barê vê yekê de bûne, neçûne seri û beravêti çûne.

HEVPEYVÎN: HELÎM YÜSIV



dûrbûnek, di navbera xwêner (xwendevan) û nivîser (nivîskar) de heye. Nivîsinê bi zimanê kurdî asta wan a zanistî û akadîmîk ne gelekî bilind e, ev yek dihêle ku rojnamegeriya kurdî berteng be.

nê kurd de û di her warê civakê de.

Qonaxa Sisiyan: Qonaxa "Gulistan"ê ye, ya ku helbestvanê navdar Cegerkewîn, piştî rawestandin "Hawar"ê ew derxistîye. Di vê qonaxê de çend kovarîn din mîna wê derketin: Gelawêj, Stêr û Rê. Lê ev kovar, ji hêlê hunerî ve, pir qels bûn. Nîrê qedexekirin û nehêniyê, mezintirîn sedemîn vê yekê bûn.

Qonaxa çaran: Qonaxa iroyîn e, vê

qonaxê li derdora sala 1990'î dest pê kiriye. Me ev kiriye qonaxeke nû; ne berdewamî ye ji qonaxa berê re. Ji ber ku hin cudayî hene, ji hêla hunerî û ji hêla mijar û babetan ve, di navbera qonaxa berê û ya niha de. Kovarê iro, ne "res-pelik" derdikevin.. Mijar û babetan wan firehitir bûne; di vê qonaxê de hin kovarine nû derkétine wekî; Aso, Zanîn, Buhar û kovara me Pirs û kovarê berê jî bi

Ser mahseran û çinîna tirî

Dema mirov behsa mahsereyan dike, yên ku ji welêt û ji cih û wanen xwe bi dûr ketine, miheeq kesereke kûr dikişinin û dibêjin: "Axx çiqas xwes bû ew rûniştina li ber çekirina dims."

Dema tê bîra mirov nostaljiyeke xwes di hişê mirov re derbas dibe. Bi rastî jî wisa ye; yên li Kurdistanê jiyanê û bi taybetî yên li herêmên çiya mane, miheeq çinîna tirî û çekirina dims û pelûlî dîstine û tu car ji bîr nakin.

Dema nêzîkiya çinîna rezan tê û gel payîzi amadekariya ji bo cûna ser mahsereyan dike, wekî cejnekê ye, wekî şahiyekê ye. Ku hemû nasen mirov wê demê kom dabin û li ser rez hev û din dibînin û bi hev şad bibin. Hemû ji deveren cur bi cur tê û bi kêf û henekan demen. xwe diborînin. Û bi ramanen xwes ji hev diqetin.

Çekirina dims hîn jî li Kurdistanê bi metodeke kevn e û pir tahdeya wê ji heye. Lî pir kêf jî tê de heye ku dema çedibe. Bi şev ku mirov li ber kûra agirê dims rûdine, bi hev re dipeyive û qala jiyanâ xwe dike, ji mirov re dibe dembi-hêrkeke pir xwes. Mirov dims dixe tepsiyeke û li ser agir dikeline û dike aqit. Pir hezkirina zarakan, ji vê aqîte heye.

Gelo yê ku bi şev li ser mahsereyan mabe û wê şevê baran bariya be, tu carî wê şevê ji bîr dîkin? Lî ku mirov dema esarvan tirî diheçikine û bang dike, dibêje selik, seliik? Carîna jî hem distire û hem bang dike tirîçinan:

Selik seliik..!

*Tirî nema selikê bîne
Tirîçin êdî betilîne*

*Selik seliik..!
Tirî bîne tirî bîne
Esarvan li benda te dimîne
Selik seliik..!
Bîrika me vala maye
Kewda şîre di ser re çûye
Selik seliik..!*

Ku mirov li nava rezan digere, tiriyê cur bi cur dibîne. Wekî tiriyê pelhûrik, tiriyê reşik, sorik, havînge, serek (tiriyê şivanan), nikulqijak, zeytî û hwd.

Wekî tê zanîn karên mahsereyan huner divê. Mirovên pîr pir serê xwe li serê diêşinin. Çekirina kûra agir, cihê kewda şîre, cihê esarê, cihê bîrikê û cihê herikê.

Tirîçin ji nava rez tirî ji mîwan yek bi yek diçinin û dixine selikan, yan li ser

g elek kesen ku koçî navçeyan kirine, tiriyen xwe dîbin malê û yan li hewşa xwe, yan jî li ser xaniyên xwe diheçikînîn û dikine dims û pelûl. Kûre û kewdeya mahserê jî li hundirê hewşê çedîkin. Ev jî ecêbeke şerê kirêt e. Ji ber wê yekê jî nalîna rezên tirî dibe dirêş û di kezeba mirov re dihere xwarê.

pişta keran dîkin û heke nêzik be jin hil-digrin ser milen xwe û tînin ji esarvan re. Esarvan vî tirî diheçikîne û şîre xwe bera bîrikê dide, dema bîrik tije dibe, wê şîreyê dixine sîtilen mezin û dikewidîne. Ji bo şîreya wan zelal bibe, hînek axa spî berî nava wî didin. Pişti şîre keliya, teş-tîn li ser kûra agir tije dîkin û agirê binê wê gur dîkin. Ev şîreya bi çar-penc sa-etañ dikele û dibe dims.

Çekirina bastêq, benî, sîncok û darikan

Bastêq: Şîreya kelandî û zelal diparzinîn. Hêdî hêdî wê û ard tevî hev dîkin.

Bi wî ardî pelûl çedibe. Wê pelûlê dîsa datînin ser agir û hetanî tê pîleya bastê-qê. Wê pelûlê datînin û li ser rûyê çaran digerînin. Ev kar bi çar, pênc mirovan çedibe. Dema çar ziwa dîbin, bastêq jê diqetînin û hiltînin.

Benî: Dema pelûl çedibe, gûzan yanê qinî (kakilê) wan bi ser ta ve dîkin û di pelûlê de dîkin. Bêhnekê li ber tavê dihêlin, pişti ku ziwa dîbe dîsa di pelûlê de dîkin. Ev sê-çar caran dubare dibe. Pişti ziwa dîbe di ard de dîkin û dihêlin zi-vistanê.

Sîncok (kesme): Sîncok jî ji pelûla tîr çedîkin. Pelûlek tîr çedîkin û carinan gûzan tevlê dîkin û carinan jî pelûlê te-nê xweşik dîbirin û hiltînin.

Darik: Şaxenî daran ên ku çar-penc şapen wan hene, paqîj dîkin û bi serê wan şaxan berûyên berî pê ve dîkin. Dû re sê çar caran di pelûlê de dîkin û li ber tavê bi dar ve dîkin. Dema ziwa dîbe, wî jî hiltînin ji zivistanê re.

Wekî din ku tişten ji şîreya tirî çedîbin, li gorî herêman cur bi cur in. Li hin deveran şîra tirî dixine kûpikan û devê wan bi heriyê diseyîn (didûn) û zivistanê di cihê meyê (şerabê) de vedixwin. Ev bi piranî adetên sûryaniyan in.

Dema pelûl çedibe, ji zarakan re cej-neke herî mezin e. Xwediyê pelûlê ji

wan re sîni keke mezin tije dike û li nava wan datîne. Zarok lê kom dîbin û bi tili-yen xwe wê pelûlê diqedînin.

Dema ser mahsereyan, ji ber ku mirov pir şiraniyê dixwin dilê mirov dihe-re tişten şor û tirş. Ji ber wê yekê jî xwaria pîvazî, şorbe û goş pir xwes e li ser mahsereyan.

Wekî me li serî jî got, dema mahsereyan wekî şahiyekê ye. Lî sed mixabin ku iro gundên Kurdistanê hemû vala bûne, şewitîne û hilweşîyane. Gelek rezên tirî şewitîne û bêxwedî mane. İro pir hindik gundiyan kurd wekî berê bi şahî û dilxwesî diherin ser rezan. Bi piranî dema mahsereyan tê, dikevine tatola vî karî. Ji ber ku ev serê kirêt heye, nikarin bi hêsanî herin ser rezên xwe û bi şev nikarin li ser rez bimîn. İcar bi lezgînî tiriyen xwe diçinin û dixin traktoran û dîbîne bajaran, bi tirîti difiroşin.

Gelek ji ber ku koç î navçeyan kirine, tiriyê xwe dîbin malê û yan li hewşa xwe yan jî li ser xaniyên xwe diheçikînîn û dikine dims û pelûl. Kûre û kewdeya mahserê li hundirê hewşê çedîkin. Ev jî ecêbeke şerê kirêt e. Ji ber wê yekê jî nalîna rezên tirî dibe dirêş û di kezeba mirov re dihere xwarê.

Ferhengok

Esarvan: Yê ku tirî diheçikîne.

Kewde: Sîtila mezin ku şîre tê de dike-lînin, bi pîvan e.

Kûre: Kûra agir e, li serê dims dikelînin

Bîrik: Bir an çala ku şîre dikevê.


Mahsere: Xaniyên li nav rezan çedîkin

Herik: Ya di binê şîreya kelandî de dimîne.

ÇIYA MAZÎ

Kula çirîzokê

MEDENÎ FERHO



Derba himandî ji ya danî çêtir el Ev gotin ya pêşiyen e. Gotinek di cihê xwe de ye, maneya xwe jî bi vir de wir de radîgîhîne. Dewleta tîr berî niha ev rewşa di çarçoveya vê gotinê de kiribû armanc ji xwe re. Kurdan, pişti çardehê gelawêja (tebaxa) heşte û çaran rewş hilweşand, li hemberî "derba himandî" desten xwe dane ber xwe..

Qonaxa iro "derba himandî" di desten kurdan de ye. Lî dewleta tîr politîkaya xwe guhert û dosten berjewendîya heşsed salî kirin dorê. Dewleten berjewendîyê kî ne? Ewrûpîne. Ewrûpî, di dîroka xwe ya dûvdirêj de her li gorî berjewendîyan politîkaya xwe meşandine. Ev mafê mirovan e, ev dad e, ev mafê komên hindik e, li cem wan xêr gotin e. Armanc yek e, dawî nayê guhertin: Wezn û pîvan li gorî çarçoveya ku ewrûpî datînin e. Kêm û zêde

baqê nîşkan e! Divê ku em ji bîr nekin ku ewrûpî tu caran hewngîrî û aqilmendiya nîşandana rê û rîbûwaran jî, ji desten xwe bernadin. Ya herî balkêş ew e ku 'Şûrê Demokles' jî di desten wan de ye. Her himandî, di ser serê mirovaniyê re bi ta û tarîşkên xaf, ne ristî ve girêdayî ye.

Tîştek heye ku pir balkêş e, her komazordest, vê pêkanîn li gorî zagon û bîrûbaweriya xwe bi kar tîne. Zarok ku mîşanî digirin, serê wan dixine bin çengenê wan û du sê caran desten xwe hêdî hêdî li nav pişta wan dixin û dibêjin: "Temir temir bavê te mir, dayika te mir..." Mîrişka lal û ebkem dengê xwe dibire, ji tîrsan hew diwêrê bêhna xwe bide bistîne. Ji bo kurdan jî rewş wilo bû!... İcar ne bes bav û dayik dimirin, xwiş, dot, pis û cîran tev di nava wê temirandina tîrtirs de bûn.


Kula çirîzokê bikeye mala mirovên xayîn û kesen ku politîkaya xwe li gorî berjewendîyan dimeşînin şev û rôkê!...

Dewleten ewrûpî ku desten xwe li me kuran dihejînin, gotina pêşî "Emê we bişînin Tîrkiyeyê. Bînîrîn hûn zêde gavê xwe diavêjin, em wilo qebûl nakin, lingê xwe zêde dirêj nekin." Gelo ev ling dirêjkirin ci ye? Weşana rojnameyekê, kovarekê, pirtûkekê

ye!... Meşek e, civînek e, pêşandanek e? Yan jî weşana MED-TV 'yê ye ku di dîroka kurdan de yekemîn car e tîştekî wilo pêk tê. Gelo çîma mafê yekî bazîrgan heye ku dikare weşanxaneyeke xwe, ci TV be, ci wekî din be, damezirîne, lî yê gelê kurdan tune ye?... Çîma ku partiyek kurdî vî karî dike?... Çîma ku rastiya şerê tîşkîjî li Kurdistanê datîne berçavan?... Çîma ku çand û wêjeya kurdî, hebûn û nebûna xwe datîne ser masetê?... Heger çandek, wêjeyek misri be jî nasnameya gelê kurd e û hilandî, di nava refen pirtûkxaneyen de, di qul û qewheren reş-tarî de namînê. Ragîhandin û zimanê zîmkâku ji dewleten kedxwer pir pir dewlemendir bi bandora xwe ya bihêz dikeve malen kurdan tevan; kesen ku iro caş in jî di nav de!... Ne hindik e!... Dijmin jî wê rabe ser lepan û ci rî û rîbûwar hebin wê bide ber xwe. Qet li pêbirk û sersedîn ku di nava xêzik û benden destûr û zagonan de mane razayî, guhdarî nake.

Bila kes ji me bi vê şad nebe û nebêje, ez ne di nava vê rekiha dîlî de me. Tekçûna vê carê giştî ye!... Kî gunehkar e, kî tawanbar e tîştekî din e û hîştina gunehkarî û tawanbarîye ya li bendeyî dâdgehiya dîrokê jî dîlxwesîya rebeniyê ye!... Ji bili kurdan tu kes nikare dadparêziya gelê kurd bike!..

Bêçarebûna kûçikê



Li herêma Mêrdinê, li dora Girê Ga sê gund hene. Ev her sê gund bi awayekî sêkoşeyî li wir cih digirin. Di navbera wan her-sê gundan de kûçikekî nedile hebû, bû-bû bela serê wan û li kîjan gundi dawet hebuya, ew kûçik, dibeziya diçû wî gundi ji bo ku hestiyên goşt bikoje. Rojekê gundi li hev dicivin û dibêjin: "Pêwist e ku em wî kûçikî bikujin." Hinek

jî dibêjin: "Na. Guneh e em wî bikujin, emê sê def û zirneyan bînin, bila li gun-dekî lêbixe, wê kûçik here wir, pey re wê gundê navîn lê bixe, wê îcar kûçik bibeze wî gundi. Piş re jî li gundê sisyan wê lêbixe. Bi vî rengî emê kûçik di navbera her sê gundan de bibin û bînin, heya ku bi xwe bimire."

Piş re sê def û zirneyan tînin. Li gundê yekemîn li def û zirneye dixin,

kûçik dibeze wir. Dinêre ku tu hestî û tu dawet tuneye. Îcar li gundê navîn li def û zirneye dixin, kûçik hema dibeze gundê navîn, li wir jî tiştekî nabîne. Bi vî rengî çend caran kûçik di navbera her sê gundan de dibin û tînin, heta ji hal dikeve. Kûçik di navbera her sê gundan de dimîne ûbihustekî zimanê wî dertê derive, hilme hilme pê dikeve, heya ku di cihê xwe de dimire.

Di roja iro de, têkoşîna gelê Kurdistanê jî, mîna her sê gundan li komara tirk dike. Gerila, li Kurdistana Başûr li dijmin dixe, dijmin bi operasyonê mezin diçe wir, lê tiştekî nabîne û tu nêçîrê jî nake. Piş re gerîla li Botanê lêdixe, disa dijmin diçe wir, lê tiştekî nabîne. Pişte jî gerîla li Dêrsimê deng dide, dijmin îcar dibeze wir, li wir jî tiştekî nabîne. Bi vî rengî gerîla ne li sê cihan bi tenê, li sed cihî li def û zirneye dixe û dijmin dibeze wan deran, lê tiştekî bi ser tiştekî naxe. Gérîlayê azadiyê bi vî rengî dijmin li pey xwe dibe û tîne heya ku birizîne û ji hev bixîne. Wê ev rewş wisa dom bike heya ku dijmin jî, mîna kûçikê navbera her sê gundan ji hev bikeve û bimire. Vêga gêj bûye, mirina wî jî nêzîk e.

DERWÊŞ KILIÇ

BIXELAT...

K	E	L	A	D	M	D	I	M	E
R	E	N	I	L	A	R	A	M	
N	E	D	E	Z	I	R	A	N	
F	A	S	I	T	I	C	P		
A	N	T	E	K	I	I	S	A	
A	S	E	M	L	E				
E	N	S	A	R	T				
H	E	V	R	A	N				
PEYVA VESARI									

Bersiva Xacepirsa 40'an

Xacepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 42'an pirtûka

Yaşar Kaya
"Gotin" e.
Jérenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, dîvê hûn
"Peyva Vêşarı" di nava qutiyêni li bin xacepirse de binivîsin û tevi adresa xwe ji me re bişînî.

GOTIN

Yaşar Kaya



Pênc kesen ku xelata xacepirsa hejmara 40'an, Pirtûka Dr. Kaws Kaftan "Baban, Botan, Soran" qezencî kirine:
Ata Selman/ Adiyaman, Çiçek Dicle/ İzmir, Melike Oktay/
Tarsus, Hamdullah Baki/ Bursa, Cemil Bilgic/ Edime.

XACEPIRSA BIXELAT (42)

Egrebe Dir 5okza- neki kurd (wêne)		Emir, prens Terimek leşkeri	7	Liman Lê (bi erebi)		Ava ku ji ber cilan maye		Bêhn, nafes Ava berfê		Kulilka berfê
2					6					
Ji bêjingê mezintir Hevala zava						Behî, matem Reh nijad				
			Ne dibi- hise, ne dipekiye Qehremân							
Dost. yar		Perê surî Belengaz	3				Üfq			
							Egoizm			
Riş, kok Tipeke alfabeya kurdi				Baxçeyê tiri Xwedayeki misri		8				
1	Kesen ji berazîyan Surwe									
Dareke avi							Tipek			
Azan				Medeni- yetek kevnar		5				

PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5 6 7 8

Ez jî şer dikim

Leşkerên tirkan rojekê dixwazin herin gundekî ji bo ku mirovek bigirin, lê riya gund nasnakin, li çiyê serlesker û leşker winda dibin. Ew dînihîrin ku mirovek ber bi wan tê, serlesker fermanê dide leşkerên xwe ji bo ku wî zilamî bigirin û bibin bibêjin, "kesê ku em lê digeriyan ev e" her wiha wê ew kes riya bajar jî nîşanî wan bide.

Leşker zilam digirin û tînin ba komutanê xwe.

Serlesker bi tirkî jê re dibêje:

- Oğlum şehrîn yolunu bize göster (Kurê min, riya bajar nîşanî me bide)

Gundi ji ber ku bi tirkî nizane, bi te-ne peyva "şehir" wekî "şer" fêm dike dibêje:

- Na ez şer nakim

Serlesker ji wisa fêm dike ku dibêje "Ez bajîr nas nakim". Leşker ji komûtan re dibêjin ka em jê navê gundku emê herinê bipirsin bila riya gund nîşanî me bide. Serlesker jê dipirse:

- Oğlum Sirdo nerde (Kurê min Sirdo li ku ye)

Gundi bi tenê peyva "sirdo" wekî "sirt" yanê piş fêm dike ku serleskerê jê re dibêje ka ezî li pişta te siwar bim.

Gundi difikire dibêje, wele wê li pişta min siwar bin. Li der û dorêne xwe dînihîre û baz dide û her ku bi rê de direve jî diqire dibêje: "Edî ez jî şer dikim".

MELEK BIRÜSK

XACEPIRSA



DİPLİM

Dewlet dixwaze tekiliya mapya, eştir û polisan vefere...



abdülkadir çiçek

WELAT

Rojnameya Hefteyi
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpirsê Karêن
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimnendeyê Gîşî

yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helsim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçlıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Mirov ziman qedexe dike?!

Destpêk Rûpel 8-9

Lê li welatekî ku ev çend şer û pevcûn pir e, nivîskar karê ku lazim e siyasetvan bikin jî hildigire ser milên xwe. Ev ne wezîfeya nivîskar e, wezîfeya wî ya esli nîn e. Lê li vir wiha ye.


Heta ev nivîskarênu ku lî Tirkîyeyê vê wezîfeyê hilnegirin, ez bi çaveke baş li wan nanêrim. Lewre ew hemwelatiyêne vê cîvâkê ne û hemwelatiyêne berpirsin... Ji ber ku ew dikarin dengê xwe bigihînin mîlet, berpirs in. Hevalên me yên ku vê wezîfeyê dikin jî pir in; em mafîn wan bin pê nekin...

Pirsgirêkén aborî...

● Rast e, pirsgirêkén aborî jî, karênu nivîskar li paş dixin. Îro ku pirsgirêkén min ên aboriyê tunebûna, min weşankarî nedîkir, minê ramanênu xwe binivîsanda. Ez ji karê weşanxaneyê gazin jî nakim, jê hez dikim, zewqê distînim, lê ku pirsgirêkén min tunebûna, min ev çend wextê xwe nedîdayê... Yanê lazim e nivîskar jiyana xwe bi nivîskariyê bidomîne, lê li vî welatê kêmwendâ ev ne mimkûn e.

We piştî gelek salan kitêba xwe ya yekemîn jî nû ve nivîsand; çîma û ev çawa hate hîjê we ku hûn kitêba xwe jî nû ve binivîsînin?

● Ji hemû romanênek yekemîn ez geleki



hez dikim; yê kîjan nivîskarî dibe, bila bibe. Lewre romana yekemîn, di nav xwe de ji emrî nivîskarî xwe gelek tiştan dihewîne. Di romana duyemîn de, êdî nivîskar xwe dirêjî derve dike. Min kitêba xwe ya bi navê "Odalarda (di odayan de)" di 22-23 saliya xwe de nivîsandiye. Di wê romanê de, ji jiyana min gelek tişt hene. Mesela ji ber muhafazekariya anadolê min jin nas nekîribûn. Naskirina min ne mimkûn jî bû. Min li Stenbolê ew delalî û xweşîya bi navê jinê nas kiriye. Ji ber vê jî, min leqeleg nekir, di romanê de rola jinê daxiste jêr...

Piştî gelek salan min di wê romanê de tiştîn gelek xweş dîtin. Û tim xwendevan ew roman ji min dixwestin, lê min nedixwest ku bi wî halê xwe derkeve. Pişt re ji weşanxaneyekê hevalekî min pir bi min ve ma, got ezê vê romanê biweşînim. Û bêyî min rîz jî kiribûn. Min got, na; du-sê mehan destûr bide min, ez careke din di ber çavan re derbas bikim.

Ez rûniştîm li serî şixlîm, lê roman eyînî roman e. Hinek der guherîn, hinek der hatîn avêtîn, hinek tiştîn nû lê zêde bûn... Ez ji wê romanâ xwe gelekî hez dikim.

ÇALAKIYÊN JI BO PIŞTGIRIYA NÇM'ê

KONSERÂ OZAN XANEMÎR



Seroka Gîşî ya Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) Nuray Şen wê bigîhe tenduristiya xwe, wê ji berê bi hézîr bibe û were nava me. Lewre wê li ser meşandînê têkoşîna me ya ku pê bawer û pê ve girêdahî bû, zêde israr kir.

Em ji bîryardar in, ji bo ku ew bigîhe tenduristiya xwe ci ji destê me bê, em xwe jê nadîn paş. Em dizanîn ku gelê me jî, ji vê yekê re hesas e. Em li benda ele-qeya gelê xwe ne.

Dîrok: 24.11.1996, Saet: 15.00
Cih: HADEP Bağcılar Stenbol
Buha: 250.000 TL

Radyoya Mizgîniyê

Li Ewrûpayê:

Her roja şemîyê (septê) êvarê di navbera saet 20³⁵ û 21⁰⁰'ê de li ser pêla navîn (MW), 1395 kHz.

Li Tirkîyeyê:

Her roja yekşemê (lehdê) êvarê di navbera saet 20³⁰ û 21⁰⁰'ê de li ser pêla kin (SW), 41 Metre, 7155 kHz.

Mizgîni, P.K. 1125, 35441
Biebertal, Almanya

Zemzema Çukurovayê: SALGAM

*d*inya-alem xurîniya xwe bi nan û çayê vedikin, lê gelê Edeneyê ji 7 salî 70 salî xurîniya xwe bi simît û şalgamê vedikin... Şalgam sewzeyeke ji malbata şêlim e. Ji meyandina hûrika savarê, xwêya gir û gizêra reş ku bi tenê li Konyayê peyda dibe, çedibe. Şalgama herî bi qelîte di fiçiyêñ darîn de, havînan di 3-4 rojan de, zivistanan jî di 10-15 rojan de tê hilberîn (îmal-kirin).

Naskirina min a şalgamê di sala 1991'ê de dest pê kir. Di dema "Şerê Kendavê" de em bi malbatî ji Batmanê hatibûn Edeneyê. Pişti çend rojan min derdor meraq kir û ez çûme sûkê. Ji serê sibehê hetanî êvarê ez geriyam. Wê rojê bêhnekê bala min kişandibû ser xwe: "Bêhna Kebabê". Hema bibêjin li serê her kolanê tebleyek hebû û kebab çedikir. Lê vexwarinek hebû ku wê jî ez gelek şaş kiribûm. Ji rengê wê ya sor gelo ava sûsê bû an jî ava wişneyê bû min baş nizanibû. Min got hebe hebe ev wişne ye. Mirov ketibûn dûv hev du qede, sê qedevedixwarin... Hela hela ev ci bû? Ez ber bi firoşkar ve çûm: "Xalo ka qedehekê bide min jî." Di firta yekemîn de bi yek carî ez vereşiyam. Bala her kesî li ser min bû û bi awayekî ecêbmâyî li min dinihêrîn. Belê ava ku wê rojê min vêxwaribû ava şalgamê bû....

Îro li Edeneyê, li navenda bajêr li gorî daxuyaniyê fermî ji 500'î zêdetir karistan û dikanê şalgamê hene. Şalgamfiroşen navdar "Ali Göde", "Şalgamçı Hacı" û "Kuruköprü Şalgamcısı" ne bi tenê li Edeneyê, li çarçoşeyen (her derê) Tirkîyeyê têne naskirin... Heta mirov dikare bibêje ku îro bajarê Edeneyê ji pembo û kebabê bêhtir bi "şalgama tûj" tê naskirin. Şalgamê li herêmê ji hêla aboriyê ve sektoreke qirase afirandîye. Xwedîyê "Şalgamçı Gürbüz"ê Abdurrahman Gürbüz ji vê rastiyê tîne ziman û wiha dibêje: "Em rojê 1000-1500 qede, salê jî 50 ton ava şalgamê difiroşin." Gürbüz pirsa me ya "Gelo hûn firotina şalgamê ji bo derveyî welêt jî difikirin an na?" wiha dibersivîne: "Ji bo ku şalgam were ixaçkirin, divê di fabrikayan de were çêkirin. Heger were çekirin tâhm û rengê xwe yê esasî nade, ji ber vê yekê jî em bi destâ çedikin, bi vî awayî jî ixaç çenabe, lê eger tiştîki wiha çêbibe em bi tenê ji xwe re coca-colayê raqîb dibînin."

Her wiha xwedîyê şalgamxaneya navdar "İçen Bilir Hacının Şalgamı" Ali Güzeloglu diyar dike ku ev 50 sal e karê şalgamê dikin û di vê pêvajoyê de jî li navenda Edeneyê 4 dikanê xwe yên şalgamê vekirine. Güzeloglu: "Karê şalgamê ji bav û bapfrîn me derbasî me bûye" dibejê û peyvîn xwe wiha didomîne: "Karê şalgamê ne karê her kesî ye."

Şalgamvanî, ji bili Edeneyê, li Tarsus, Mersin, Geyhan û Osmaniyyeyê jî tê kirin, lê tâhm û renga şalgama Edeneyê serkêşiyê nade tu kesî. Li gorî pisporênduristîyê, şalgam dermanê mîde û çavan e, li hêla din xwarînê herî giran jî dimehîne.

Şalgama Edeneyê îro bûye malê gel, ne bi tenê gelên herêmê (fellah, evdal, tirk) her wiha ji aliyê kurdan ve jî hatiye ecibandin. Îro li 22 taxê Edeneyê ku %85'ê wan kurd in, bi sedan kesen kurd li ser tableyê xwe yên bi 3 tekkel, şalgamê difiroşin... Anglo nanê zarokê xwe ji şalgamê derdixin. Yek ji wan jî Metin Bahçeci



ye.

Metin Bahçeci ji gundê Goveşîla Eruha Sêrtê ye. Ew dibêje: "Kesê ku nû tê Edeneyê, zû bi zû şalgamê navexwe, bi çavekî çawa ku mîda wî jê xera bibe dînihêre, lê pişti demekê, meraq dike û qedehekê vedixwe, êdi nikare careke din dev jê berde..." Xalê Remezanê 64 salî ku ev 4 sal e ji Nisêbîna Mêrdînê hatiye jî wiha

dibêje: "Li Kurdistanê dermanê dilê me "Ava sûsê" bû, lê bi saya dêlika Çillerê, Silo û Kerbeqan em di van deveran de derketin û şalgam jî cihê sûsa me girt!..."

Heger rojek riya we bi Edeneyê bikeve, cara ewil xwe biavêjin aşxaneyekê. Hûnê wê gavê li ber kebabâ xwe miheqeç ji wê ava sor bibînin...

SÂLIHÊ KEVIRBİRÎ

